

"Şaneyên veşartî" ... serkêşên stratejîya DAIŞ`ê ya şerî ji bo vejandina "Xîlafetê"



"Gelek sedemên sîyasî, aborî û civakî yên terorê hene, lewra şerê li dijî şaneyên veşartî yên rêxistina DAIŞ`ê û rêgirtina li ber vegera wê pêwîstîya xwe bi terxankirineke sîyasî û aborî, her wiha çare û stratejîyeke gişgir heye"

Mistefa Mistefa – Lêkoler li Navenda Fîratê ya Lêkolînan

2015

Rizgarkirina bajarê Kobaniyê
ji hêla YPG û YPJ`ê ve

2014

Berfirehbûna desthilata rêxistinê
û ragihandina "Dewleta Xîlafetê "

2013

Bidawîkirina girêdana
xwe bi "Qaidê"re

2017

Rêxistinê bajarên mezin
ji dest dan

2011

Derbasbûna bo Sûriyayê

DAIŞ.. Ji dema derketiye heta li Baxozê têk çûye

2018

Hikûmeta Şamê dest datîna
ser deverên dawîn li başûrê welêt

2006

Damezirandina qaşo
"Xîlafeta Îraqê"

2019

QSD`ê têkçûyîna
DAIŞ`ê li Baxozê ragihand

2004

Li Îraqê derket



Hemû mafên weşanê ji bo Navenda Firatê ya Lêkolînan parastî ne 2024 ©



Navenda Firatê ya Lêkolînan

Sazîyeke lêkolînan a serbixwe ye, giranîyê dide mesele û dozên siyasî, aborî û fikirî yên girêdayî herêma Rojhilata Navîn û Sûrîyayê bi giştî, û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi taybet.

[/https://firatn.com](https://firatn.com)

alfiratn@gmail.com
Qamishli – Syria

Kurtenaverok

Ev lêkolîn qonaxa piştî têkçûyîna erdnîgarî ya rêxistina Dewleta Îslamîk li Îraq û Şamê li ser destê Hêzên Sûrîyaya Demokratîk (QSD) û Hevpeymanîya Navdewletî di Adara 2019`an de digire nava xwe. Di naveroka xwe de girîngîyê dide stratejîya ku rêxistina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê dimeşand, ew jî piştî ku gelek herêmê û rûber li Îraq û Sûrîyayê ji destê wê derketin. Ev stratejî xwe dispêre danezana bi navê "Xezewat Îztinzaf" ku di bingeha xwe de piştî xwe bi şaneyên veşartî yên bi ser rêxistinê ve û li tevaya herêmê berbelav in xurt dike (Beşa Yekem).

Li rex wê, ev lêkolîn gelek faktorên ku hiştin û hîna jî dihêlin rêxistin ber bi pêş ve biçê bi ronî dike, ev faktorên ku dibin xalên lawaz û derfet da ku şaneyên rêxistinê bi kar bînin, çalakîyên xwe li dar bixin û operasyonên xwe yên terorîst bi cih bikin. Li milekî din, lêkolîn sîyast û stratejîya QSD û Hevpeymanîya Navdewletî ya derbarê şerê li dijî DAIŞ`ê, piştî têkçûyîna wê ya leşkerî sala 2019`an, jî dinirxîne, heta ku di dawîyê de digihêje hin encam û qewêtîyan li gorî tiştî di naverokê de hatîye (Beşa Duyem).

Pêşgotin

Pêwîstîya qonaxa piştî têkçûyîna rêxistina DAIŞ`ê ya leşkerî bi lêkolînkirina meseleya çawanîya danûstandina bi paşmahîyên vê rêxistinê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re heye, ev paşmahîya ku ji girtîyên rêxistinê, jin û zarokên wê yên li kamp¹ û navendên rehabîlîtasyonê² û bi taybet ji şaneyên wê yên veşartî pêk tê.

Têkçûyîna Dewleta Îslamî li Iraq û Sûrîyayê (DAIŞ) piştî rizgarkirina xala wê ya dawîn li bajarokê Baxozê yê Dêra Zorê li rojhilatê Sûrîyê di sala 2019an de, ji alîyê Hêzên Sûrîyayê Demokratîk (QSD) bi piştevanîya hevpeymanîya navdewletî ya li dijî DAIŞê, ne bidawîbûna kontrola wê rêxistinê li ser bakur û rojhilatê Sûrîyê bû, lê belê destpêka qonaxê nû bû, ku di hûrgilî, rewş, stratejî û çarçoveya xwe de ji qonaxa berê cuda

¹ Vegere: "Binpêkirinên rêxistina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê- Danaşîna qanûnî û dadgehên taybet (Beşa Yekem)" – Navenda Firatê ya lêkolînan: <https://firatn.com/kur/?p=2494>

² Vegere: Zarokên DAIŞ`ê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê.. (Metirsî, kêşe, û rêyên çareserîyê) – Navenda Firatê ya lêkolînan: <https://firatn.com/kur/?p=2461>

bû, ew jî dema ku DAIŞ di asta herî bilind ya hêza xwe de bû. Qonaxek ku mirov dikare jê re bêje "veguhêz" ew jî ji ber ku encama veguheztina rêxistinê ji serkêşîyeke navendî ber bi serkêşîyeke ne-navendî û damezrandina tora têkilî û ragihandinê di nav sîstemeke nerm de ye. Bi vê yekê êdî "Serkeftina giştî" ya ku ji hêla serokê berê yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê Donald Trump ve li dijî rêxistinê di sala 2019-an de hate ragihandin, dimîne xala destpêka şerekî ku ji şeş sal berê hesastir û tevlihevtir e.

Li nik wê, ew têkçûyîna erdnîgarî êdî bû xaleke guhêrbar a binghîn, çî di dîroka nêzîk a rêxistinê de, çî jî di sîyaseta QSD`ê ya li dijî DAIŞ`ê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de, çimkî li vir DAIŞ`ê stratejîyeke nû ya li gorî rewşa qonaxa heyî pejirand, û di vê stratejîyê de piştî xwe bi şaneyên xwe yê veşartî ku li tevaya xaka Sûrîyayê berbelav in, nemaze li bakur û Rojhilatê wê, xurt kir. Vê yeka han hişt ku guhertin di taktîk û stratejîya QSD`ê de ya li dijî evan şaneyên ku bûne palpişt û serkêşa stratejîya DAIŞ`ê ya di ber vegeer û jinûvevejandina xeyalên "Xîlafetê" encam bide.

Li gorî tiştî me li jor gotî, di vê lêkolîna ku beşek ji rêzelêkolînên navenda Firatê yê derbarê dosyaya rêxistina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ye, me guhertinên hevwestî ragihandina têkçûyîna erdnîgarî ya rêxistina DAIŞ`ê, û veguhertinên di stratejîya wê şerî de bi ronî kirin, di serî de jî ragihandina "Xezwat El-Îstinzaf". Her wiha, em balê dikişînin ser taktîk û planên şaneyên veşartî yê ji bo vejandina rêxistinê û piştgirîkirina wê, ev şaneyên ku hemû faktor û rewşên navdewletî, herêmî û xwecihî bi kar tînin û çalakîyên xwe zêdetir dikin da ku xebatên şerî li dijî DAIŞ`ê asteng bikin û rê li ber têkçûyîna wê ya bi temamî bigirin. Di evan mijarên han de, me xwe spartîye hevdîtinên meydanî yê bi endamên girtîyên ên wan şaneyan ku li cem QSD`ê girtî ne, hemwestî wê, em li xwemukirhatinên hin şaneyên veşartî yê berê jî vegeerîyan. Her wiha me xwe spartîye hevdîtinên bi berpîrsên QSD`ê û Rêveberîya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re jî, li nik wê, em li hin raport, lêkolîn û madeyên çapemenîyê yê girêdayî mijara lêkolînê vegeerîyan.

Pirsgirêka Lêkolînê

Pirsa evê lêkolînê di çarçoveya destnîşankirin û beyankirina xeterîya şaneyên veşartî yên rêxistina DAIŞ`ê li Sûriyayê û bi taybet li bakur û rojhilatê wê digere. Ev herêmên ku di dema berfirehbûna desthilata DAIŞ`ê li Sûriyayê û Îraqê li jêr kontrola wê bûn, ev kontrolkirina ku di encama xebatên QSD bi piştevanîya Hevpeymanîya Navdewletî di Adara 2019`an de beravêtî bû, nemaze piştî ku çalakî û êrîşên şaneyên DAIŞ`ê li tevaya herêmê û cîhanê zêde bûn. Evê yeka han hişt ku şerê li dijî rêxistinê derbasî qonaxeke nû û aloztir bibe, çimkî rêxistinê di vê qonaxê de piştî xwe bi şaneyên xwe yên veşartî xurt kir ew jî di ber parastina hebûna û dirêjkirina temenê xwe de, ew jî di wextekî de ku gelek faktorên alîkar hebûn û di encamê de ev şaneyên han bûn bilokê bingehîn yê vegeza "Xîlafeta rêxistinê" careke din û ji nû ve.

Lewra, em dikarin bi kurtî pirsgirêka lêkolînê bi vê pirsê bingehîn zelal bikin: **Çawa şaneyên veşartî yên girêdayî rêxistina DAIŞ`ê dikarin bibin serkêşa stratejîya leşkerî ya jinûve-vejandina "xîlafetê", û gelo faktorên alîkar çi ne?**

Her wiha bi van pirsên din jî:

- Awayê stratejîya şerî ya nû ya DAIŞ`ê çilo ye?
- Çi girîngîya şaneyên veşartî di wê stratejîyê de ye?
- Gelo ti têkilî yan girêdan di navbera şaneyên veşartî û stûnên paşmahîya DAIŞ`ê yên din de hene, her wekî jin û zarokên li kampan û girtiyên li girtîgehan?
- Çawa herêmên sûrî yên li jêr dagîrkirina Tirkîyayê li bakur rojavayê Sûriyayê dibin deverên bi ewle ji rêxistina DAIŞ`ê re, û ji şaneyên wê yên li bakur û rojhilatê Sûriyayê re dibin palpişt?
- Çi faktorên xwecihî, herêmî û navdewletî hene ku ji bo bipêşveçûna rêxistinê û astengkirina xebatên şerê li dijî wê dibin alîkar?
- Gelo xebatên heyî yên QSD û Hevpeymanîya navdewletî li dijî şaneyên veşartî yên DAIŞ`ê têrê dikin an na?

Girîngîya Lêkolînê:

Girîngîya vê lêkolînê ew e ku beşek girîng ji paşmahîya mirovî ya DAIŞê li bakur û rojhilatê Sûrîyayê ronî dike ew jî şaneyên wê yên veşartî ye. Ev şane xaleke destpêkirinê ji bo projeya DAIŞê ya ji nû ve avakirina "xîlafetê" temsîl dikin. Di wextekî de ku civaka navdewletî ji ber alozî û pevçûnên li çaralîyê cîhanê diqewimin paşguh kirîye, ev alozîyên ku bi awayekî ji awayan dibin sedema bipêşveçûna rêxistina DAIŞê û zêdebûna çalakîyên şaneyên wê yên veşartî.

Armancên Lêkolînê:

- Zelalkirina stratejîya DAIŞê piştî têkçûyîna wê ya erdnîgarî sala 2019`an li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.
- Tezekirina li ser bidawînebûna rêxistina DAIŞê tevî ku serdestîya wê ya erdnîgarî nema.
- Lêkolînkirina çawanî, awa û çalakîya şaneyên DAIŞê yên veşartî li Sûrîyayê.
- Beyankirina girîngî û rola şaneyên DAIŞê yên veşartî di stratejîya wê ya nû de.

Rêbaza lêkolînê:

Di vê lêkolînê de, me rêbazeke wesfî û analîtîk pejirand, bi rêya destnîşankirina û pênasekirina taybetmendîyên şaneyên veşartî yên DAIŞê li Sûrîyayê, û ravekirina kar, çalakî û girîngîya wan di stratejîya rêxistinê de wekî ku di rastîyê de heye. Her wiha bi rêya Şirovekirina faktorên ku wê ji hêla kalîteyî û hejmarî ve piştgirî dikin, û ravekirina taybetmendîyên wê, cewherê fonksiyona wê, û cihê wê, li ser bingeha lêkolîneke meydanî û serjimarîyên ku xwe dispêrin çavkanîyên vekirî û girtî.

PLansazîya Lêkolînê:

Beşa Yekem: Stratejîya DAIŞê ya şerî piştî ketina "Xîlafetê" li Sûrîyayê

Xala Yekem: Guhetina stratejîya DAIŞê ya şerî

Yek: Şaneyên DAIŞ`ê yên veşartî û tevgera wan li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

Du: Pejrandina "Xezwatên Îstinzafê"

Sê: Êrîşa li ser "Zindana Xiwêranê"

Xala Duyem: Têkilîyên di navbera şaneyên veşartî û stûnên din ên paşmahîya DAIŞ`ê

Yek: Têkilîyên di navbera şaneyên veşartî û malbatên rêxistinê yên li kampan

Du: Şanyên veşartî fermanên xwe ji herêmên li jêr dagirkerîya Tirkîyayê werdigirin

Beşa Duyem: Faktorên bi vegera "Xîlafetê" re alîkar

Xala Yekem: Faktorên herêmî-navdewletî

Yek: Ragihandina amerîkî ya jinaçûyîna bi temamî ya rêxistinê sala 2019`an û derketina nexweşîya Coronayê

Du: Şerê Ukrayînî-Rûsî

Sê: Êrîş û binpêkirinên berdewam ên dewleta Tirk li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

Çar: Şerê li Xezayê

Xala Duyem: Faktorên Navxweyî

Yek: Derengmayîna çareserîya sûrî (dabeşbûna Sûrîyayê bo herêmên hegemonî hişt tevgera şaneyan hêsan bibe)

Du: Derxistina fitine û pevketinên mezhebî

Sê: Netêrbûna xebatên li dijî terorê

Dumahî: Encam û qewêtî

Beşa Yekem:

Stratejîya DAIŞ`ê ya şerî piştî ketina "Xîlafetê" li Sûrîyayê

Dewleta Îslamî ya Iraq û Şamê (DAIŞ), ku di lîsteya terora navdewletî de ye, ji destpêka xwe ve hem li Sûrîya û hem jî li Iraqê taktîkên şerê êrîşkar dimeşand û heta radeyekê dikarî li ser lingê xwe bimîne, îcarê sala 2015an deverên berfireh ên her du welatên navborî kontrol kirîye. Lê, di destpêka sala 2016an de, rêxistinê nedikarî kontrola xwe berfireh bike û êdî hino hino bajarên mezin ji dest didan her wekî bajarê Mûsilê li Iraqê û Reqa (ku wekî paytexta xîlafetê dihat naskirin) li Sûrîyayê di sala 2017an de. Ev yek bû sedem ku rêxistin bikeve qonaxeke tevlihev û nekarîna xurtkirina hêza xwe, ku ev yek jî hişt ew stratejîyeke "paşveçûnê" qebûl bike, û ji bo berdewamkirin û parastina hebûna xwe, xwe bispêre şaneyên xwe yên veşartî. Bi vî awayî, têkçûna DAIŞê li cihê wê yê dawî li bajarokê Baxozê di sala 2019`an de nîşana dawîya kontrola erdnîgarî ya "xîlafetê" bû. Piştê rêxistinê stratejîyeke nû pejirand, li gorî şert û mercên guherbar û şîyanan xwe diguncand. Ev yek di dîroka rêxistina terorîst de bû destpêka qonaxek. Anku bi jidestdana kontrola xwe ya erdnîgarî, wê dev ji projeya xwe ya "xîlafetê" berneda, lê belê hemû şîyan û hêzên xwe ji bo ji nû ve ragihandina wê terxan kir. Ev yeka han ji bilî hebûna têkilî û danûstandinan di navbera van şaneyan û stûnên din ên paşmahîya DAIŞê de; mîna jin û zarokên di kampan de, endamên wê yên girtî, û serkirdeyên wê li bakur-rojavayê Sûrîyê.

Berîya em van têkilîyên han (Xala duyem) vekolin, em dê guhertina di stratejîya DAIŞ`ê de çêbûyî bikolin.

Xala Yekem: Guhertina stratejîya DAIŞ`ê ya şerî

Hilweşîna erdnîgarî ya DAIŞ`ê piştî şerê Baxozê hişt ku ev rêxistina terorsît rastî gelek fişaran were û berê xwe bide pejrandina stratejîyeke nû ku operasyonên leşkerî yên kevneşop û şerê çekdarî yê bi lêçûnên herî kêr û bidûrî şerê rasterast ê ku dê ji hêza wê ya qels zêde bixwe di

nava xwe de bihewîne, çimkî ev stratejîya han³ dê tenê xwe bispêre bikaranîna çekên sivik, di wextekî gelekî kurt de pêk were, rastî ti bersivdayînê neyê û bi awayekî bilez dê were encamdan.

Di vê xala ji lêkolînê de em dê bi korahî behsa şaneyên veşartî bikin, her wekî pênaseya wan, girîngîya hebûna wan ji DAIŞ`ê û hebûna DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re. her wiha çawa ev şaneyên han bûna mîna zemîneke xurt ji vegeza DAIŞ`ê û xîlafeta wê re. ev yeka hank u di "Xezwat El-Îstinzaf" de belî bû û mînaka wê jî êrîşa li ser zindana Xiwêranê ya bajarê Heseke bû.

Yek: Şaneyên DAIŞ`ê yên veşartî û tevgera wan li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

Şaneyên terorîst: Ev têgiheke tê wateya çekirina komek ji kadroyên rêxistinî yên ku bi awayekî komî û ji bo armancekê yan zêdetir dixebitin û her yek ji wan xwedî roleke destnîşankirî ye. Ev rol di navbera peywira fikirî, darayî, çalak û neçalak de diguhere. Piranîya şaneyan ji ber sedemên ewlehî, lojîstîkî û torî ji komên piçûk ên heta 10 endaman pêk tên. Her şaneyek bi gelemperî girêdayî serkirdeyekî meydanî ye û dibe ku çend şane li heman herêmê bêyî hevpewendî hebin, tevî ku di rastîya xwe de girêdayî yek serkirdeyekî ne⁴.

Lê têgiha "Şaneyên veşartî" tê wateya komek an rêxistneke tundirew ku dişibehe "rêxistina El-Qa`îdayê", ji dûr ve ji bo armancekê dixebite. Ev şaneyên han bi dûrî lêveger û rêxistinên kevneşop ên teqlîdî kar dikin û ti formeke rêxistinî yan hizbî ya veşartî yan jî naskirî li xwe nagirin, ev yek dihêle ku xwe ji ber çavan bide alî û êrîşn herî tund bi awayekî azad û nerim pêk bînin. Her rêxistinek ji bo çalakîyên van şaneyan stratejîya xwe heye. DAIŞê stratejîyeke taybet heye, ku bi navên cûrbecûr wekî "gurên bi tenê", "alîgir" û "piştgir" hatiye binavkirin. Xeterîya wan ji şaneyên birêxistinî ne kêmtir e. Pêwendîya di navbera rêxistinên tundrew û şaneyên veşartî de ne têkilîyek xêzikî ya liberçav e ku tê de girêdana yekem an serîya yekem ji serîya sêyem were veqetandin. Lê belê, ew

³ مصطفى أمين عامر، "استراتيجيات داعش بعد انهيار جغرافية التنظيم"، موقع العين الإخبارية – آخر زيارة: 23 سبتمبر/أيلول 2024- الرابط: <https://al-ain.com/article/terrorism-geographically>

⁴ موقع اعتدال، الرابط: <https://etidal.org/reports/cells>

têkilîyek rêxistinî ya bi awayekî avahîsazî hev girtî ye. Ew komêk e ku heman îdeolojîya tundrew û rêkeftinên nenivîsandî⁵ parve dike.

Operasyonên QSD û hevpeymanîya Navdewletî li dijî DAIŞê heta radeyekê serkeftî bûne, ji sala 2019an û vir ve hejmara çekdar û operasyonên terorîst kêm kirine û hêza wê li herêmê sînordar kirine. Li gorî Neteweyên Yekbûyî, hejmara çekdarên DAIŞê "bi tevahî" - ango çekdarên ku bi rastî li Iraq û Sûrîyayê şer dikin an piştgirîyê didin rêxistinê - ji nêzîkî 14,000-18,000 di Sibata 2019an de daketîye 3,000-5,000 di Çileyê 2024an⁶ de. Wekî din, di vê heyamê de çar ji serkirdeyên rêxistinê⁷ û çend endamên payebilind hatine kuştin, di heman demê de êrîşên ku rêxistinê li Sûrîyayê îdîa kirîye salane⁸ ji (1,055) di 2019an de daketîye (608) di 2020an de, (368) di 2021an de, (297) di 2022an de, û (121) di 2023an⁹ de. Lêbelê, xetera vegera DAIŞê li Sûrîyayê bi giştî û li bakurê rojhilatê welêt bi taybetî hîn jî heye, nemaze bi hebûna hejmareke mezin ji şaneyên wê yê veşartî li herêmê.

Êrîşên ku rêxistinê li xwe girtine li gorî salan

⁵ محمد نعمة السماوي، "الخلايا النائمة والتقنيات المتطورة لصناعة الإرهاب"، دار الكتب التاريخية ناشرون، الطبعة الأولى، 2015-ص22.

⁶ Li gorî texmînên Ajansa Îstixbarata Parastinê ya Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA), di Tebaxa 2018an de li Iraq û Sûrîyayê heta 30,000 çekdarên DAIŞê hebûn. Jennifer Cafarella bi Brandon Wallace û Jason Zhou re - Vegera Duyemîn a DAIŞê: Nirxandina Serhildana Pêşerojê ya DAIŞê:

<https://2u.pw/yxYXGh5s>

⁷ Têkçûna vê rêxistinê bi kuştina serokê wê yê yekem, Ebû Bekir el-Bexdadî, ji aliyê hêzên Amerîkî ve di Cotmeha 2019an de di operasyoneke leşkerî ya Amerîkî de li Îdlibê, bakurê rojavayê Sûrîyayê, gihîşt lûtkeyê.

- Di Sibata 2022an de, Dewletên Yekbûyî kuştina serokê duyemîn ê rêxistinê, Ebû Îbrahîm el-Qureşî, ew jî li Îdlibê ragihand.


- Di sala 2022an de, rêxistina terorîst mirina serokê xwe yê sêyemîn, Ebû Hesên el-Haşimî el-Qureşî, piştrast kir, ku di pevçûnên bi çekdarên herêmî re li başûrê Sûrîyayê de mirîye.

- Di 3ê Tebaxa 2023an de, DAIŞê di tomareke dengî de mirina serokê xwe yê çaremîn, Ebû Huseyîn el-Huseynî el-Qureşî, di pevçûnên bi Heyet Tehrîr el-Şam (berê Cebhet el-Nusra) re li bakurê rojavayê Sûrîyayê ragihand.

⁸ Aaron Y. Zelin, Devorah Margolin - The Islamic State's Shadow Governance in Eastern Syria Since the Fall of Baghuz: <https://2u.pw/XtGQDYKg>

⁹ ديفورا مارغولين وكميل جابلونسكي، "بعد خمس سنوات على سقوط الخلافة، لا يزال الكثير كما هو في شمال شرق سوريا" الرابط: <https://2u.pw/OjnwVYw1>

الهجمات التي تبناها التنظيم حسب الأعوام




Wekî din, ev rêxistin li seranserê cîhanê çalak e. Ji Adara 2023an heta Adara 2024an, beşa medyayê ya navendî ya DAIŞê berpîrsîyarîya (1,121) êrîşan girt ser xwe. Li gorî daneyên ku ji hêla rêxistinê ve hatine weşandin, li gorî Enstîtuya Washingtonê ya ji bo Sîyaseta Rojhilata Nêzîk¹⁰, di van êrîşan de bi qasî 4,770 kes hatine kuştin an jî birîndar bûne.

Êrîşên ku "Dewleta îslamîk" li xwe digirtin li gorî salan

¹⁰ هارون ي. زيلين وإيلانا وينتر، "عام واحد على خريطة أنشطة تنظيم الدولة الإسلامية على الصعيد العالمي"، معهد واشنطن لسياسات الشرق الأدنى. آخر زيارة: 25 أغسطس/آب 2024- الرابط:

<https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/am-wahd-ly-khrytt-anshtt-tnzym-aldwlt-alaslmyt-ly-alsyd-alalmy>

الهجمات التي تبنتها "الدولة الإسلامية" حسب الأعوام



Lewra dixuye ku rêxistina "DAIŞ`ê tevî têkçûyîna xwe ya leşkerî sala 2019`an hîna çalak e û xwe li gorî rêbazên şerî yên li dijî wê tîn bikaranîn diguncîne. Di vê derbarê de, hikûmeta amerîkî destnîşan kir ku ew dûr nabîne DAIŞ careke din vegeer Sûrîyayê. Ji 14`ê Adara 2024`an DAIŞ`ê 84 êrîş li Sûrîyayê girtin ser xwe û ev asta bilind a êrîşan ji berîya niha di raportên wê de dihatin cudatir e. li rex wê, hîna endamên DAIŞ`ê pabendî jinûvevejandina "Xîlafeta" xwe ya herêmî ne, ev ji bilî bi dehhezaran ji alîgir û girtîyên wê yên ku çarenûsa wan ne dîyar û ev yek bixwe dihêle rewşa ne aram xerabtir bibe¹¹.

Eger em werin li hejmara mezin a endamên rêxistinê li Îraq¹² û Sûrîyayê binêrin û bidin ber çalakîya zêde ya şaneyên wê yên veşartî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê em dê bibînin ku karînen mirovî yên li cem rêxistinê piştî "Baxozê" gelekî bibandor nebûne, çimkî heta niha jî xebat, operasyonê û pêngavên QSD û Hêzên Ewlekarîya Hundirîn (asayîş) bi hevkarîya Hevpeymanîya Navdewletî li dijî wan şaneyên veşartî berdewam in. Di 16`ê Temûza 2024`an de Fermandarîya Navendî ya amerîkî (CENTCOM) ragihand ku rêxistina DAIŞ`ê ya terorîst çalakîyên


¹¹ ديفورا مارغولين وكميل جابلونسكي، "بعد خمس سنوات على سقوط الخلافة، لا يزال الكثير كما هو في شمال شرق سوريا" -الرابط: <https://2u.pw/OjnwVYW1>

¹² Ev ji bilî hêmanên ku DAIŞê li welatên din ên Rojhilata Navîn, Afrîka, Asyaya Navîn û Ewropayê bi kar anîye, ku faktorek piştgirîyê ji bo rêxistinê li Sûrîya û Iraqê pêk tînin, çî ji hêla piştgirîya darayî û lojîstîkî ve, an jî ji hêla piştgirîya mirovî û fikirî ve.

xwe yê leşkerî li Sûrîyayê û Îraqê duqat kirine, û piştî gelek salan ji têkçûyîna karînên¹³ wê, ev rêxistina han ber bi jinûvexweavakirinê ve diçe. Lê eger em werin li ser erdê binêrin em dê bibînin ku rewş ji daxuyanîya amerîkî xerabtir e, dibe ku ji ber Fermendarîya Navendî ya amerîkî tenê êrîşên ku DAIŞ digire ser xwe dihesibîne, lê weke tê zanîn û ji bo ku DAIŞ balê nekişîne ser armancên xwe yê jinûvevegerê, ji çend salan ve DAIŞ tenê çend êrîşên mezin li Sûrîyayê û Îraqê girtine ser xwe û qala yê din nekirîye.

Ji bo wê, jinûvevegera DAIŞ`ê li Sûrîyayê êdî li ber çavan e û li gorî CENTCOM`ê evê rêxistinê di navbera Hezîrana 2023 û Hezîrana 2024`an de 153 êrîş tenê li Sûrîyayê pêk anîne, lê li gorî şopandina êrîşên DAIŞ`ê bi giştî dîyar dibe ku hejmara wan êrîşan 551 êrîş li herêmên li jêr kontrola QSD û rejîma sûrî ne.

Li gorî daneyên li jêr, êrîşên DAIŞ`ê li Sûrîyayê sala 2024`an zêdetir bûne¹⁴



Gelek rapor, daxuyanî û lixwemukirhatinên şaneyên DAIŞê hene piştrast dikin ku hîn jî ew şîyanên xwe yê leşkerî diparêze û li Sûrîyê piştgirî werdigire. Êrîşên ku ji hêla şaneyên wê yê veşartî ve li herêmê têne kirin, tenê nîşanek e ku rêxistin xwe ji nû ve organîze dike û hêzên xwe kom dike da ku rastîyên nû hem li herêmê û hem jî li seranserê cîhanê

¹³ بيان القيادة المركزية للقوات المسلحة الأمريكية "سنتكوم": <https://2u.pw/UkSeV5FK>

¹⁴ Charles Lister - "CENTCOM says ISIS is reconstituting in Syria and Iraq, but the reality is even worse": <https://2u.pw/hR0uj0p8>

ferz bike, ya herî berbiçav vejandina tiştê ku jê re "Xîlafeta Îslamî" tê gotin e, nemaze li deverên bakur û rojhilatê Sûriyayê, ku qaşo bajarê Reqa paytexta "xîlafeta" wê bû. Ev hemû bi rêya şaneyên wê yên veşartî yên ku li hemû deverên bandorê li Sûriyê belav bûne, tê kirin.

Şaneyên veşartî jêrsazîya bingehîn a vejandina "Xîlafetê" ne

Hemû êrîş û operasyonên ku ji hêla şaneyên veşartî yên rêxistinê ve li bakur û rojhilatê Sûriyayê têne kirin, bi taybetî êrîşên li ser zindan û kampan, beşek ji planên berê yên rêxistinê ne, ku di sala 2021an de hatine plankirin, ew jî bi armanca daneberdan serkirde û endamên rêxistinê yên xwedî pisporî û tecrube di çêkirina teqemenîyan û pêkanîna operasyonên taybet de. Rêxistinê hêzên xwe seferber kirîye û endamên nû kom kirîye da ku tevî wê bibin, bi taybetî li çola Sûriyayê, lê hê jî kêmasîya endam û serkirdeyên xwedî ezmûna serkirdayetiye û rêxistinî heye. Ji ber vê yekê, xwe dispêre şaneyên xwe yên veşartî ji bo vegera xwe, ku di salên piştî têkçûna leşkerî ya rêxistinê di 2019an de hatibû plankirin¹⁵.

Li gorî lixwemkirhatinên şaneyên veşartî yên ku niha di destê QSDê de ne, rêxistin niha girîngîyê dide meseleya komkirina hejmareke baş ji endamên DAIŞê, dû re êrîşkirina ser zindanên¹⁶ ku endamên DAIŞê lê ne, û her wiha êrîşkirina ser kampên ku malbatên DAIŞê li Hol û Roj li bakur û rojhilatê Sûriyayê lê dimînin.

Ebdulrezaq Hemed el-Selame¹⁷, endamekî DAIŞê ku ji aliyê Hêzên Sûriyayê Demokratîk ve hatîye girtin, îdia dike ku şaneyên veşartî yên

¹⁵ Hevdîtinek bi berpîrsê ofîsa ragihandinê ya QSD, Ferhad Şamî, di 7'ê Temûza 2024'an

¹⁶ Di 29ê Tebaxa 2024an de, pênc endamên DAIŞê dema ku ji bo girtîgehekê li Reqayê dihatin veguhestin, revîyan. Hêzên Sûriyayê Demokratîk (QSD) û hevpeymanîyê du ji wan û serkirdeyekî ku revîyana wan hêsan kir girtin. Di bersivê de, daxuyanîyek ji Fermanarîya Navendî ya Amerîkayê û QSDê hat gotin ku armanca sereke ya DAIŞê azadkirina şervanên xwe yên niha girtî ye û bi vî awayî "DAIŞê vejîne". General Michael Erik Kurilla, fermanarê Fermanarîya Navendî ya Amerîkayê, got: "Zêdetirî 9,000 girtîyên DAIŞê li zêdetirî 20 navendên binçavkirinê yên QSDê li Sûriyayê mane, bi rastî û mecazî 'artêşa DAIŞê' di bin çavdêriyê de ye. Ger hejmareke girîng ji van çekdarên DAIŞê birevin, ev ê ji bo herêmê û derveyî wê gefek mezin be. Em ê bi civaka navneteweyî re bixebitin da ku van çekdarên DAIŞê ji bo pêvajoya dawî vegeerînin welatên wan ên resen."

<https://2u.pw/rGrvxfOY>: استكمال البحث عن سجناء «داعش» في الرقة بمساعدة استخبارات «التحالف»، الرابط:

¹⁷ Bi navê "Ebû Muaz" tê nasîn, ew plankerê du teqînan li bajarê Heseke bû di êvara Newrozê ya 2015an de, ku di encamê de 53 sivîl, piraniya wan jin û zarok bûn, hatin kuştin. Wî her wiha êrîşa li ser baregeha Hêzên Ewlekarîya Navxweyî li Qada Baytara li Heseke di 6ê Gulana 2015an de, ku di encamê

rêxistinê binesazîya bingehîn a vegera wê ne û ji bo êrîş û çalakîyên din ên li herêmê ew dikevin tevgerê. Endamê girtî bi bawerî dibêje, "Rêxistin hîn xilas nebûye," û ew şaneyên veşartî ne ku hebûn û berdewamîya wê biparêzin¹⁸.

Di derbarê meseleya ka şaneyên veşartî yê rêxistinê çawa çek, cebilxane, alav û pereyan bi dest dixin wî şirove kir ku berî rêxistin li Hecîn/Dêra Zorê têk biçe, Ebû Îbrahîm Elreqawî (kesê ku alîkarîya Ebdulrezaq Hemed kir ku tevî rêxistinê bibe) bi rêya tankereke sotemenîyê barhilgirek çekan şand û wan ew li çolê veşartin. Wî her wiha rave kir ku berî ew li deverên Şedadê û Dêra Zorê têk biçin, wan çek li deverên çolê veşartin, û her gava ku pêdivîya wan bi çekan hebûya, Ebû Îbrahîm wan ber bi cihên wan ve dibir. Derbarê pereyan de, ew dibêje ku ew ji pereyên li bankên Tirkîyê hatine razandin bi rêya şîrketên veguhastina pereyan ên wekî "Khawaja Company" û carinan jî ji Idlibê ji wan re tê şandin. Wî got: "Di nav kêmtirî salekê de, min zêdetirî 70,000 dolar wergirt"¹⁹.

Evî endamê bi navê "Ebdilrezaq Hemed El-Selame" nêzîkî 30²⁰ şaneyan ava kir, her şaneyek ji 4 heta 5 endaman pêk dihat, ku piranîya wan endamên rêxistinê bûn, ji herêma Dêra Zorê hatin derxistin û ber bi

de 16 endamên hêzê hatin kuştin, bi karanîna otomobîlek bombekirî û pênc xwekujan plan kir. Wî her wiha otomobîla bombekirî ya ku di 23ê Hezîrana 2015an de li çerxerêya Sinalco li Heskê teqîya, û teqandina mayînek ku wesayîtek leşkerî ya Hêzên Demokratîk ên Sûrîyayê li ser Rêya El-Xerafî hedef girt, ku di encamê de heşt şervan hatin kuştin, plan kir. Otomobîla bombekirî ya ku di 14ê Îlona 2015an de li nêzî çerxerêya Xeşman li bakurê bajarê Heskê dewrîyeyek Hêzên Ewlekarîya Navxweyî hedef girt, ji bilî pêkanîna zêdetirî şeş kuştinan, hejmarek sivil û karmendên Hêzên Ewlekarîya Navxweyî kuştin.

ANHA - الجزيرة - عشرات الهجمات في الحسكة و تفجير نوروز الحسكة مع العقل المدبر لتفجير نوروز الحسكة و عشرات الهجمات في الجزيرة - ANHA
18 خلال وجودها في السجن؛ أجرت موفدة قناة العربية مقابلة خاصة مع أحد عناصر داعش الموقوفين، تحدث فيها عن خلايا التنظيم النائمة في المنطقة. المقابلة موجودة في الرابط التالي: <https://www.youtube.com/watch?v=e0JsCv81S2A>
19 مركز توثيق الانتهاكات، اعترافات: خلية مولتها تركيا قامت بتنفيذ 20 عملية وتسببت بمقتل 200 شخص- الرابط: <https://vdc-nsy.com/archives/26250>

-المقابلة الاساسية للعنصر المعتقل والتي أجرتها وكالة أنباء هاوار موجودة على الرابط التالي:
<https://www.youtube.com/watch?v=o6QxruAFz34>

²⁰ Yek ji van 30 şaneyan şaneya Ebû Elî El-Biksî ye, ku di 29ê Kanûna Pêşîn a 2018an de li Dêra Zorê Merwan El-Fetih, hevserokê Encumena Qanûndanîyê ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, kuşt. Her wiha di 21ê Çileyê 2019an de, di bin ferman, plansazî û çavdêriya Ebdulrezaq Hemed El-Selame de, ku ew jî beşdar bû, êrîşa xwekujî ya li dijî dewrîyeyeke hevpeymanîya navneteweyî li ser rêya Şedadîyê – Rêya 47 – pêk anî. [Li çavkanîya berê binêre.]

Tirkîyeyê ve hatin birin û piştire bi rêya herêmên di bin dagirkerîya Tirkîyeyê de ber bi herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ve hatin şandin²¹.

Ebdulrezaq Hemed el-Selame piranîya şaneyên veşartî li herêmên Heseke, Şedad û Til Temir ên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi rê ve dibir. Ew tekez dike ku wî hemû êrîşên ku ji nîvê sala 2018an heta girtina wî li van deveran hatine kirin, bi rê ve dibirin û plan dikirin, ev ji bilî dayîna agahîyên îstîxbaratî yên berfireh ji Ajansa Nûçeyan a Amaq a fermî ya rêxistinê re. Wî her wiha eşkere kir ku "Komîteya Şerîetê" ew wek cîgirê qaşo "Emîrê Dewleta El-Berakayê" tayîn kirîye, piştî ku wî operasyona ku dewrîyeya Hevpeymanîya Navdewletî kir armanc pêk anî, di wê êrîşê de şaneya wî ya bi nave "Ebû Elî Bêksî"²² jî beşdar bû.

Der barê mekanîzmaya çalakîyên şaneyan de, Ehmed Fewaz El-Rehman (24 salî), endamekî ewlehîyê di şaneyên veşartî yên DAIŞê de, ku niha ji alîyê Hêzên Sûrîyayê Demokratîk ve hatîye girtin, eşkere dike, "Di destpêkê de, me herêm dişopand û agahî berhev dikirin, û dûv re me êrîşî cih û mirovên hedefgirtî li bajarê Heseke, li bakur-rojhilatê Sûrîyayê dikir. Wekî din, me welatî û milkên wan bi hinceta ku wan zekat nedaye rêxistinê dikir armanc"²³.

Her wiha, Ehmed bi demançeyê ku ji şaneyên li herêmê yên ku bi rêkûpêk bi hev re têkilî datînin bi dest xistibû du sivîl li Heseke kuştin. her wiha dibêje ku wî baregeh û navendên QSD`ê yên li herêmê kirin hedef²⁴.

Rêbazên ku ji bo gefxwarin û destnîşankirina hedefan têne bikar anîn dikarin cûda bibin. Endamên rêxistinê dikarin agahdarîyên mohrkirî li ser derîyên mal an otomobîlên qurbanîyan daliqînin, ji bilî şandina peyaman bi rêya WhatsAppê²⁵.

²¹ Çavkanîya berê

²² Çavkanîya berê.

²³ Wekî ku di Mijdara 2023an de qewimî, dema ku Ehmed otomobîla welatîyekî li Heseke şewitand piştî ku wî welatîyî red kir ku zekatê bide şaneyên DAIŞê. Hevpeyvîneke Navenda Firatê bi Ehmed Fewaz El-Rehman re li navendeke ragirtinê ya QSD`ê, 6ê Hezîrana 2024an.

²⁴ Çavkanîya berê.

²⁵ "زكاة بالإكراه.. داعش يفرض الإتاوات على ميسوري الحال في دير الزور"، وكالة نورث برس، <https://2u.pw/tudditbp>

Hewldanên vegera DAIŞê tenê bi operasyonên wê yên terorîstî ve ne sînordar in. Wekî din, hewldanên wê yên tecnîdkirina leşkeran berdewam dikin her çend kontrola xwe ya herêmî winda bike jî. Tecnîdkirina ciwanan ji çar aliyên cîhanê bi têkçûna leşkerî ya rêxistinê re nesekinî. Berevajî vê, wergirtina leşkeran bêtir hevrêz û rêkûpêk bûye, û rêxistin niha şaneyên xwe li seranserê Sûrîyayê, heta li welatên cîran jî, hene ku kar dikin. Ev jî di wextekî de ku faktorên ku ew bikar tîne sûdê ji wan werdigirin peyda û hêsan in.

Li Libnanê, ku lê dixebitî, Ehmed di hevdîtina bi zilamekî ji Deraa re de, başûrê Sûrîyê, ku endamê Dewleta Îslamî bû, bi kesekî sêyem ê ji Qamişloyê, bakur rojhilatê Sûrîyê re hevdîtin kir. Bi rêya vî kesî, Ehmed dilsozîya xwe da rêxistinê û dû re çû Derayê. Der barê armancên xwe yên tevlihbûnê de, ew dibêje: "Min Dewleta Îslamî wekî aliyê herî guncaw û rast li Sûrîya û herêmê ji bo tevlihbûnê dît. Pêxember Muhammed gotîye: "Di her serdemê de mezhebeke Îslamî heye ku Misilmanan diparêze û ji bo wan şer dike". Rêxistin, berevajî "El-Qaîde" û "Talîbanê", bi dijminên neteweyê re, wek Amerîka, ku çavkanîyên herêmê talan dike, hevalbendî nekirîye"²⁶.

Hejmara mezin a operasyon û êrîşên ku ji hêla şaneyên veşartî yên rêxistinê ve li bakur û rojhilatê Sûrîyayê hatine kirin nîşan dide ku rêxistin dikare şîyan û derfetên wê ya berbiçav di lêgerîna xwe ya ji bo "vegera xîlafetê" de bikar bîne. Bi bikaranîna teknolojîyên herî nû, danûstandin di navbera serkirdeyên rêxistinê û şaneyên veşartî de berdewam dike. Her wiha, xuya dike ku kêmasîyên ewlehîyê û şert û mercên herêmî û navneteweyî hene ku rêxistin ji bo pêkanîna operasyonên xwe û berdewamîya çalakîyên xwe sûdê werdigire.

Bi kurtasî, xuya ye ku serkirdeyên DAIŞê bi piranî bi rêya peyamên li ser înternetê rênimayên giştî didin, ew jî li şûna fermanana rojane ji endam û alîgirên rêxistinê re li Sûrîyayê. Lewra dixuye ku ev rêxistin îro li ser du stûnan dixebite²⁷: bingehek zexm ji çekdarên tundrew ku di bin fermanarîyê de tevdigerin û êrîşên tevlihev pêk tînin, di heman demê

²⁶ Hevdîtinek li gel Ehmed Fewaz El-Rehman, di 6`ê Mijdara 2024`an de.

²⁷ "احتواء تنظيم الدولة الإسلامية الذي يظهر قدرة على البقاء في شمال شرق سورية"، 18 تموز/يوليو 2022 | تقرير الشرق الأوسط رقم 236، ص4.

de komeke mezintir, her çend nenavendî be jî, ji şaneyan êrîşên piçûktir û zêdetir pêk tînin, gel ditirsînin û karûbarên darayî bi rê ve dibin. Bi vî awayî, DAIŞê torên xwe yên ragihandinê yên ku herêmên cuda yên welêt bi hev ve girêdidin xurt kirine, rolên taybet dane şaneyên xwe yên li her deverê, çalakîyên xwe yên li her herêmê wekî xurtkirina çalakîyên xwe yên li herêmên din dibîne.

Bi gotineke din; Niha rêxistin dikare bibe du beşên sereke: beşek navendî ku li deverên ku ji bo rêxistinê û serkirdeyên wê yên asta yekem hawîrdorek ewle peyda dikin, wekî çola Sûrîyayê, ku ji hêla hêzên bi ser hikûmeta Şamê ve tê kontrolkirin, cih digire. Ev erdnîgarî rê dide rêxistinê ku hebûneke mezin ava bike, û hêsankarîya hêzên hikûmeta Şamê bi tevgerên rêxistinê re. Ji bilî herêmên opozîsyona Sûrîyê yên ku ji aliyê Tirkîyê ve têne piştgirîkirin li bakurê Sûrîyê, ku ji bo serkirdeyên rêxistinê hawîrdorek ewle pêk tînin. Firqeya duyem ji şaneyên belavbûyî li çend deverên bakur û rojhilatê Sûrîyayê pêk tê, ku bi wergirtina fermanan ji firqeya yekem wekî amûran bi awayekî serbixwe tevdigerin.

Bi vî awayî, DAIŞê herêm dabeşî sektoran kir, her yek ji wan xwedî şaneyên şer û serkirdeyên xwe bû. Şane bi gelemperî ji du heta pênc endaman pêk tên ku çekên sivik û teqemenîyan bi kar tînin. Çekdar li pêşîya fermandarê herêmî berpîrs in, û ew fermandar jî li pêşîya serkirdeyê herêmê berpîrs e. Şane bi zanebûn ji hev cuda dixebitin, da ku heke endamên şaneyekê werin girtin, ew agahî li ser şaneyek din nedin. Rewşên hevrêzîyê, wek mînak dema ku du an jî zêdetir şane ji bo destpêkirina êrîşekê li hev dicivin, xuya ye ku li ser asta sektorê têne birêvebirin.

Çekdarên DAIŞê hema bêje her tim nêzîkî baregeha xwe ya resen dimînin, bi taybetî yên li Reqa û kembera bajarî ya li Gelîyê Firatê yê Navîn. Şaneyên ku li deverên gundewarî yên wekî Kebş û Hezîma li bakurê Reqayê, an jî li Şedadê li başûrê Heseke dixebitin, di tevgerên xwe de nermtir in. Ev şane ji tevlihevîyek ji niştecihên herêmî -bi taybetî li Dêra Zorê- û koçberan -bi taybetî li Reqayê- pêk tên ku koçber rêjeyek girîng a çekdaran pêk tînin. Karbidestên ewlehîyê bawer dikin ku gelek ji van şaneyan li çolê ne ku sînorê parêzgehên Reqa, Heseke û Dêra Zorê ye, ji wir jî ber bi başûr ve diçin da ku êrîşan bidin destpêkirin.

Serkirdeyên şane û sektoran jî li derveyî cihên ku çekdar li wir herî çalak in dijîn²⁸.

Di encamê de, armanca vê dabeşandina birêxistinê ya DAIŞ`ê ew e ku careke din li ser lingê xwe bisekine û rûberên berfireh vegehe jê kontrola xwe bi rêya xwespartina li "Xezweyên Îstinzafê".

Du: Pejrandina "Xezweyên Îstinzafê"

Piştî ku DAIŞê li Sûrîya û Iraqê rûberên berfireh ji dest da, şerên dijwar ên ku Hêzên Sûrîyayê Demokratîk (QSD), bi piştgirîya Hevpeymanîya Navdewletî, li dijî rêxistinê dimeşand, hiştin ku DAIŞ tarûmar bibe û serîbinîhev bibe. Gelek endamên wê hatin kuştin û gelekên din jî hatin girtin û dîlgirtin. Bi hezaran endamên wê û malbatên wan bi hev re li herêma Baxozê²⁹ teslîm bûn. Lê belê, di 29ê Nîsana 2019an de, nêzîkî mehek piştî Şerê Baxozê, tomarkirinek vîdyoyî ya rêberê DAIŞê Ebûbekir eEl-Bexdadî³⁰ hate weşandin, û tê de wî ji peyrewên xwe xwest ku stratejîyek nû li gorî rewşa heyî ya rêxistinê bimeşînin, û rêbazek bi navê "êrîşên ji holê rakirinê (Xezwat Îstinzaf)" qebûl bikin. Bexdadî got, "Şerê me di hemû astan de şerê westandin û bipaşxistinê ye". Xetên vê stratejîyê bi ragihandina destpêkirina operasyonên bi navê "Êrîşên jiholêrakirinê" tê zanîn, ji aliyê rêxistina medyayî ya El-Bettar a rêxistinê ve di 1ê Hezîrana heman salê de derketin holê.

Ji ber vê yekê, hêdî hêdî bi hilweşîna "Xîlafetê", serkirdeyên DAIŞê bi awayekî sîstematîk planên awarte çêkirin, çekdar li deverên dûr bi cih kirin, embarên çekan ava kirin, û heta 400 milyon dolar xerc kirin da ku xwe wekî hêzek amade ji bo şerekî çekdarî amade bikin û ji nû ve organîze bikin. Bi gotineke din, ew bi awayekî sîstematîk ji rêvebirina dewletek bi mîlyonan kesan derbasî meşandina şerekî çekdarî yê ne wekhev bûn. Di Îlona 2018an³¹ de, berdevkê Pentagonê dema ku li ser amadebaşîya berdewam³² a DAIŞê ji bo şer nîqaş dikir, DAIŞ weke

²⁸ احتواء تنظيم الدولة الإسلامية الذي يظهر قدرة على البقاء في شمال شرق سورية، ص 21

²⁹ تقرير لموقع بي بي سي، آخر زيارة: 23 سبتمبر/أيلول 2024، الرابط: <https://2u.pw/fcs7zucG>

³⁰ وكالة رويترز، آخر زيارة: 23 سبتمبر/أيلول 2024، الرابط: <https://2u.pw/jMzq3gdK>

³¹ "ما بعد دولة الخلافة: الأيديولوجيا، الدعاية، التنظيم والجهاد العالمي"، مجموعة باحثين، مؤسسة فريديش ايبيرت، مكتب الأردن والعراق، 2021، ص 104.

³² Combined Joint Task Force-Operation Inherent Resolve Press Briefing By Col. Ryan via Teleconference

dijminekî "serhişk" bi nav kir û hişyarî da: "Ez ê vekirî bêjim DAIŞ hîn nehatiye têkbirin, û her çend di kêlîyên dawî yên armancên xwe yên xerab de be jî, ew hîn jî berdewam dike". Di Gulana 2019an de, generalekî brîtanî di hevpeymanîya dijî DAIŞê de cewherê şerê nû yê şikandina DAIŞê rave kir û got: "DAIŞ ji nû ve xwe di toreke şaneyan de birêxistin dike, û armanc dike ku serokên payebilind, rûspîyên gundan û personelên leşkerî hedef bigire da ku ewlehî û aramîya li Iraq û Sûrîyayê têk bibe. Çekdarên DAIŞê hîna jî hewl didin dewrîyeyên ewlehîyê bixin kemînê, teqemenîyên destçêkirî biteqînin û mirovan birevînin. Tevî şikestinên di kontrola xwe ya herêma de, ew kom hîn serkeftinan' bi dest dixin, û îdeolojîya wê mirovên ji çar alîyên cîhanê ber bi xwe dibe"³³.

Berî ku hegemonîya xwe li Sûrîya û Iraqê berfireh bike û "xîlafeta" xwe ragihîne, DAIŞ gelek caran stratejîyeke "jholêrakirinê" li deverên ku nikarîbû bi tevahî kontrol bike dimeşand. Piştî têkçûna xwe li "Baxozê" dîsa vegeherîya wê stratejîyê, û bi vî awayî vegere taktîkên şer ên berê yên rêxistinê û careke din kete qonaxa meşa ber bi "xîlafetê" ve, ew jî bi rêya xwespartina li rêbaza êrîşên vedizî, windabûn û veşartinê di çolê de; her wiha êrîşkarên xwekuj ketine nav refên hêzên rêkûpêk, li deverên hedefgirtî teqemenî bi kar anîne, û xwe di nav sivîlan de veşartine. Ev yek jî dihêle hêzên artêş û welatên ku di êrîşên DAIŞê de rastî taktîkên wiha hatine biwestin³⁴.

Ev êrîş ji hêla şaneyên komên piçûk ve têne kirin ku ji hêla endamên rêxistinê ve têne rêvebirin, û armanc û rêbazên êrîşê bi têkilîyek rasterast bi birêveberîya rêxistinê re dîyar dikin. Bi vî awayî, rêxistin li gelek cihan operasyonên fermî pêk tîne, komên mezin êrîşî hedefan dikin da ku balê ji armancên girîngtir bi dûr bixin. Ev taktîk bi gelemperî ji bo êrîşkirina li ser rêyên ku çend bajarokan, nemaze gundên piçûk, bi hev ve girêdidin tê bikar anîn. Bi vî awayî, ev taktîk, ku ji hêla rêxistinê ve bi rêya

from Baghdad, Iraq . وزارة الدفاع الأمريكية (2018). (بالإمكان مراجعة المصدر السابق ص105).

³³ Çavkanîya berê.

³⁴ "مرصد الإفتاء: "غزوات الاستنزاف" استراتيجية الدواعش للعودة إلى الخلافة المزعومة"، موقع دار الإفتاء المصرية، آخر زيارة: 22 أغسطس/آب 2024- الرابط: <https://cuts.top/HDHZ>

rojnameya wê ya fermî "El-Neba"³⁵ di hejmara xwe (185) de eşkere kir, xetera şaneyên veşartî yên di nav rêxistinê de eşkere dike³⁶.

Halê hazir DAIŞ vê yekê bi awayekî stratejîk dike û xwe dispêre cûrbecûrkirina operasyonên xwe yên li ser erdê li deverên ku lê belav bûye, ku ji hêla şaneyên piçûk ve têne kirin ku hejmara wan ji (3-10) kesan pêk tê, û di navbera bicihanîn, çavdêrîkirin, ewlehî û komên yedek de tên guhertin.

Armanca rêxistinê ji van operasyonan ew e ku zîrarên herî mezin bide hêzên dijmin, û bi sabotaj û wêrankirina çavkanîyên dabînkirinê û xetên ragihandinê yên di navbera sektorên wê de dest pê bike. Her wiha armanc dike ku windahîyên herî mezin bide alav û leşkerên dijmin her wekî hêzên piştgir û lojistîk yên operasyonên li dijî terorê da ku di dawîyê de moralê şervan û şerkeran bişkîne û bawerîya wan bi fermanîya wan a sîyasî û leşkerî lawaz bike³⁷.

Di vê derbarê de, êrîşa li dijî zindana Xiwêranê li bajarê Heseke, weke nimûneya evê stratejîya kevne-nû yak u DAIŞ li xwe girtîye di ber vejnadina "Xîlafetê" de, tê dîtin.

Sê: Êrîşa li ser "zindana Xiwêranê"

Ji êrîşa bêhempa ya Hamasê ya li ser Îsraîlê di 7ê Cotmeha 2023an de û vir ve Rojhilata Navîn bi qeyranekê re rû bi rû maye. Bi taybetî zêdebûna êrîşên şaneyên veşartî yê DAIŞê li Sûrîyayê. Raportek di rojnameya Brîtanî The Guardian de piştrast kir ku "hêzên ewlehîyê li seranserê Rojhilata Navîn ditirsin ku pevçûna li Xezayê rêbide DAIŞê û El Qaîdeyê ku refên xwe li seranserê herêmê ji nû ve komîserhev bikin, û dibe di meh û salên pêş de bibe sedema pêlek êrîşên terorîstî. Berpirs û analîst dibêjin ku ji berê ve nîşaneyên zêdebûna tundrewîya Îslamî ya çekdar li gelek deveran hene, her çend faktor bi hev re dibin sedema vê zêdebûnê. Di mehên dawî de, êrîşên zêde yê rêxistinê li Sûrîyayê fikaran zêde dikin⁷⁹."

Islamic State activity since 2023



⁷⁷ "بمعدل نحو استهداف كل يوم.. المجموعات التابعة لإيران تستهدف القواعد الأميركية في سورية 54 مرة منذ مطلع العام الجديد نحو 40 منها على حقل العمر وكونيكو" – المرصد السوري لحقوق الإنسان- الرابط: <https://2u.pw/YPH1Hd2L>

⁷⁸ Di 28ê Çileyê 2024an de, rayedarên Amerîkî mirina sê leşkerên Amerîkî û birîndarbûna 34 leşkerên din di êrîşeke bi droneyan de li ser baregeheke Amerîkî li Urdunê (Birca 22) piştrast kirin. Armancgirtina baregehên El-Tanf li Sûrîyê û "Birca 22" di nav axa Urdunê de êrîşa herî girîng li ser hebûna Amerîkî li herêmê bû, û yekem êrîşa ku ji destpêka şerê li ser Xezeyê ve di nav hêzên Amerîkî de ku qurbanî bi xwe re anî.

⁷⁹ Jason Burke- "Gaza conflict could fuel IS and al-Qaida revival, security experts warn"- The Guardian- Link: <https://2u.pw/E2zMK2Cb>

Rojnameyê nexşeyek wêneyî li rapora xwe zêde kir ku deverên herî girîng ên ku êrîşên DAIŞê di sala 2024an de li gorî sala 2023an zêde bûne nîşan dide. Li gorî nexşeyê, Sûrîya herêma herî berbiçav e ku ji destpêka şerê li Xezeyê di navbera Îsraîl û Hamasê de êrîş û çalakîyên zêde yên şaneyên DAIŞê lê çêbûne.

Neteweyên Yekbûyî jî di raporekê de her wiha destnîşan kir ku "ragihandinên giştî yên ku ji 7ê Cotmeha 2023an vir ve ji aliyê DAIŞê ve hatine kirin" bal kişandin ser "Bikaranîna rewşa li Xezayê ji bo seferberkirina şaneyên veşartî di ber pêkanîna êrîşan de⁸⁰".

Beşa Duyem: Faktorên navxweyî

Ji ber aloziya krîza Sûrîyayê, derengketina çareserkirina wê, em nikarin bandor û karvedanên faktorên herêmî û navdewletî ji faktorên navxweyî yên xwecihî li Sûrîyayê veqetînin, ku di nav wan de ya herî girîng berdewamiya şer û şiddeta krîzê ye, û di heman demê de alîkarîya Dewleta Îslamî (DAIŞ) dike ku vegere û "xîlafeta" xwe vejîne. Ev faktor (herêmî, navdewletî û navxweyî) pir caran li ser yek rêyê rastî hev tên, ji ber ku şert û mercên navxweyî dikarin di encama faktorek herêmî de, wekêrîşên dewleta Tirkîyeyê li dijî herêmên rêveberîya xweser li bakur-rojhilatê Sûrîyayê, ku rewşek bêaramiyê li herêmê û mijûlbûna hêzên herêmî (QSD û Hêzên Ewlekarîya Navxweyî) bi van êrîşan re bi xwe re tînin, û bi vî rengî DAIŞ van şert û mercan bikar tîne. Wekî din, êrîşên milîs û alîgirên Îranê li dijî hevpeymanîya navdewletî û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hem li Sûrîya û hem jî li Iraqê jî dikarin di heman çarçoveyê de werin nirxandin. Deverên ku herî zêde rastî êrîşên şaneyên veşartî yên DAIŞê li dijî QSDê tên, ew deverên ku li Dêra Zorê, rojhilatê Sûrîyayê, ji aliyê milîsên ku Îran piştgiriyê dide wan ve tên kontrolkirin in. Di encamê de, axa Sûrîyayê dabeşî herêmên hêzên hegemon ên navdewletî (Tirkîye, Amerîka, Rûsya, Îran) bûye û ev dever her êşa destwerdana derve û pevçûna hêzên herêmî û cîhanî dikişînin. Ev yek bûye sedema çêbûna valahiyên ewlehîyê ku tevgerên rêxistinê hêsan

⁸⁰ Raport li ser vê lînkê ye: <https://2u.pw/a3FD2b8J>

dike, û balkişandina ser pêkanîna ajandeyên navneteweyî li ser hesabê şerê li dijî DAIŞê, wek mînak gurkirina nakokîyên mezhebî. Ev yek, di encamê de, dibe sedema têkbirina hewldanên dijî-terorê û astengkirina operasyonên nerm, her wiha hewldanên ku ji alîyê QSD ve, bi piştgirîya hevpeymanîya navdewletî, li dijî şaneyên DAIŞê têne kirin, ji gihîştina armancên xwe yê xwestî bi dûr dikevin, nemaze li deverên ku ji rêxistinê hatine paqijkirin.

Yek: Derengmayîna çareserîya sûrî (Dabeşbûna Sûrîyayê bû herêmên hegemon tevgera şaneyan hêsan kirîye)

Bêguman şerê li dijî terorîzmê li Sûrîyayê beşek yekgirtî ya krîza Sûrîyayê⁸¹ ya berfirehtir e. Hewldanên ji bo bidawîkirina gefa terorîzmê û bandorên wê bi dîtina çareserîyek berfireh û domdar ji bo krîza Sûrîyayê ve girêdayî ne. Ji ber vê yekê, her derengketinek di çareserkirina krîzê de dikeve ber berjewendîyên rêxistinên terorîst, bi taybetî DAIŞ. Nemaze ji ber ku krîza Sûrîyayê ji şer an krîzek navxweyî bêtir bûye mijarek herêmî-navdewletî. Ev ji ber destwerdanên bîyanî, destpêkirina şerên wekalet û pevçûnên ku bi awayekî ji awayan bi rojevên derve ve girêdayî ne, û dabeşkirina Sûrîyayê di nav deverên bandorê de ye. Ev yek bûye sedema alozî û pevçûnan di navbera hêz û alîyên ku şerê li dijî Dewleta Îslamî (DAIŞ) girtine ser xwe de. Wekî din, ev rewş tevgera şaneyên veşartî yê DAIŞê hêsan dike û şert û mercên ewlehî û siyasî diafirîne da ku stratejîya xwe ya vejînkirina rêxistinê bi rê bixin. Berdewamîya krîza Sûrîyayê di heman demê de tê wateya jinavçûna şert û mercên mirovî û jîyanî, ku ev jî derketina civakên xizan û paşguhkirî ku dibin nêçîra hêsan ji bo şaneyên veşartî yê DAIŞê bi xwe re tîne, nemaze di warê leşkerkirin û propagandayê de.

Hevpeymanîya Navdewletî ya şerê li dijî DAIŞê di têkçûna jeopolîtîk û leşkerî ya rêxistinê de di sala 2019an de roleke sereke û girîng lîst.

⁸¹ Bibinketina "Bihara Erebi" li Sûrîyayê yek ji mînakên herî zelal ên afirandina hawîrdorek guncaw ji bo belavbûna rêxistinên terorîst, di nav de DAIŞ. Ji roja yekem a tevgera gelêrî ya aştîyane li Sûrîyayê ve, rejîma Sûrîyayê bi tundî, girtin, tasfîyekirin û îşkenceyê dixwest rûbirûyî vê tevgerê bibe. Rejîma Sûrîyayê her wiha sîyasetek ji bo wêrankirina deverên serhildêr û bombebarankirina wan bi balafir û topan dimeşand. Bi rûbirûbûna vê rastîyê re, tevgera aştîyane veguherî çalakîyên çekdarî, û DAIŞê derfetek dît ku di nav axa Sûrîyayê de berfireh bibe. Ew karîbû tevahîya Parêzgeha Reqayê, ku xalek girîng ji bo berfirehbûna rêxistinê li Sûrîya û Iraqê bû, bigire destê xwe. Her wiha ew di kontrolkirina hin beşên Parêzgehên Dêra Zorê û Heskê de jî bi ser ket. ص 86 ما بعد دولة الخلافة.

Lêbelê, alozî û pevçûnên di navbera dewletên endam de di nav Sûriyayê de hîn jî valahî û qelsiyên ku ji hêla şaneyên veşartî yê DAIŞê ve têne bikar anîn dimînin. Mînakî, Tirkîye, endamek Hevpeymanîya Navdewletî ya Têkbirina DAIŞê, rasterast beşdarî sîndarkirina hewldanên Hêzên Sûriyaya Demokratîk (QSD)⁸² ji bo jiholêrakirina rêxistinê û jiholêrakirina şaneyên wê yê veşartî dibe. Ev bi rêya hedefgirtin û êrîşên berdewam ên ku Tirkîyeyê dem bi dem li deverên bakur û rojhilatê Sûriyayê pêk tîne, encam dide. Heta radeya hedefgirtina şervanên⁸³ QSDê ku rasterast li kêleka Hevpeymanîya Navdewletî di şerê li dijî DAIŞê de beşdar bûne dema ku rêxistin di lûtkeya hêza xwe de bû. Ev ji bilî aloziyên di navbera Îran û DYA`yê de ye, ku tê wateya vegera şert û mercên berê yê ku DAIŞê ji wan sûd wergirtibûn û tevger û çalakîya xwe zêde kiribû.

Dibe ku ne hewce be were wateya dubarekirina ezmûnê, lê ev tê wateya ku derfetek çêtir ji bo rêxistinê were dayîn da ku stratejiyên xwe yê pêşerojê ji nû ve ava bike, biguncîne û binirxîne⁸⁴.

Xalid Îbrahîm⁸⁵, endamê Gerîndeyê Birêveber a Têkilîyên Derve ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyayê, dibêje "Nebûna çareserîyeke sîyasî ya berfireh û yekgirtî li Sûriyayê tê wateya berdewamîya kaosê û afirandina atmosfereke berhemdar û guncaw ji bo tundrewî û tundûtûjîyê, bi vî rengî hawîrdorek ji bo berdewamîya çalakîya DAIŞê diafirîne. Wekî din, rageşiyên di navbera hêzên navneteweyî û herêmî yê ku di şerê Sûriyayê de beşdar in û destwerdanê dikin, hevrêziya navneteweyî ya ji bo şerê li dijî DAIŞê tevlihev dike. Di encamê de, operasyonên li dijî DAIŞê di demek dirêj de dê kêmtir bibandor bin. Dibe ku hêzên herêmî û navneteweyî serkeftinên leşkerî bi dest bixin, lê ew ê nikaribin rehên ku rêxistinê xwedî dikin ji holê rakin bêyî aramîya sîyasî li Sûriyayê û çareserkirina krîza li wir."

⁸² Hevkarê sereke yê Hevpeymanîya Navdewletî ya şerê li dijî DAIŞê li Sûriyayê.

⁸³ Di Kanûna 2023an de, îstixbarata Tirkîyê berpîrsîyarîya kuştina Ronî Welat, fermanzarekî payebilind ê Hêzên Sûriyaya Demokratîk, bi bombeyekê li Dêra Zorê girt ser xwe. Ronî Welat beşdarî şerê li dijî rêxistina terorîst a DAIŞê li Dêra Zorê bû û bi hevrêziya eşîrên herêmî û hevpeymanîya navneteweyî re xebitî.

⁸⁴ د. محمد أبو رمان - "مستقبل داعش: عوامل القوة والضعف (ديناميكيات «الخلافة الافتراضية» وفجوة استراتيجيات مكافحة الإرهاب)" - تشرين الثاني 2020 / نوفمبر - ص 14

⁸⁵ Hevpeyvîneke amadekarê lêkolînên bi wî re, 21 Tebaxa 2024`an.

Du: Gurkirina fitine û pevketinên neteweperest li Dêra Zorê

Bajarokê Baxoz li gundewarê Dêra Zorê, devera dawî ya rêxistina terorîst DAIŞê, di Adara 2019an de ji aliyê Hêzên Sûrîyayê Demokratîk û hevpeymanîya Navdewletî ve hate rizgarkirin. Wê demê, bajarok baregeheke sereke ya rêxistinê bû. Lêbelê, ji wê demê ve, bajarê Dêra Zorê⁸⁶ û gundewarê wê ji ber gurkirina nakokîyên mezhebî, ji lewazî û alozîyên ewlehîyê yên ku heta roja îro jî berdewam dikin, êş kişandîye. DAIŞê ev alozî û kaos bikar anîye da ku bi rêya şaneyên xwe yên veşartî gelek operasyonên terorîst pêk bîne, ku bi kuştina sivîl⁸⁷, serokeşîr û endamên sazîyên Rêveberîya Xweser hedef digirin⁸⁸, di domandina alozîyên ewlehîyê de rolek dilîzin.

Van şaneyan her wiha gelek êrîş li dijî Hêzên Sûrîyaya Demokratîk (QSD) û kuştina çend serokeşîrên ereb li Dêra Zorê "bi navê eşîran" pêk anîne, bi armanca gurkirina nakokî û alozîyên mezhebî di navbera QSD û eşîrên li wir de. Wekî din, "rejîma Sûrîyayê carinan hin ji eşîrên xwe yên dilsoz di têkilîyên nerasterast bi rêxistinê re bikar tîne. Bi gotineke din, ev eşîr rola navbeynkaran di navbera rejîm û rêxistinê de dilîzin, şaneyên DAIŞê tînin derbasî herêmên Rêveberîya Xweser dikin. Di derbarê vê yekê de lixwemukirhatinên şaneyên girtî hene⁸⁹, û ev rastîyek nayê înkarkirin. Wekî din, rejîma Sûrîyayê û Rûsya hêsankarîyê⁹⁰ bi çalakîyên rêxistinê li

⁸⁶ Parêzgeha Dêra Zorê di navbera hêzên rejîma sûrî û milîsên bi ser Îranê ve ji aliyekî ve (rojawayê çemê Firatê) û di navbera QSD`ê ji aliyekî din ve (rojhilatê Firatê).

⁸⁷ Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan (SOHR) ji destpêka sala 2024an vir ve 189 operasyon (166 ji wan tenê li Dêra Zorê) ku ji hêla şaneyên DAIŞê ve li deverên di bin kontrola Rêveberîya Xweser de hatine kirin, belge kirîye. Ev operasyon êrîşên çekdarî, kuştinên hedefgirtî û bombebaran dihewîne. Li gorî belgeyên SOHR, hejmara mirîyan di van operasyonan de gihîştîye 88an.

⁸⁸ <https://2u.pw/INaxRgE3> خلايا التنظيم "تهاجم حاجزاً لقوى الأمن الداخلي" الأساس في ريف دير الزور الشرقي - الرابط: <https://2u.pw/snlonkiW> تقرير الخلايا النائمة لشهر ديسمبر - داعش يغتال مدنيين مرتبطين بإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا- مركز معلومات شمال وشرق سوريا - الرابط: <https://2u.pw/snlonkiW>

⁸⁹ "المخابرات السورية تقف خلف اغتيال وجهاء العشائر العربية" - وكالة الفرات- الرابط: <https://n9.cl/tm4d5>

⁹⁰ Piştî ku operasyonên DAIŞê sala 2019'an xurtir bûn, êdî leşkerên rejîmê bûn qurbanên sereke ji ber stratejîya rejîmê ya şerî ya ne-çalak. Di vê derbarê de, rejîmê dewrîyeyên xwe tenê li deverên xelka wan gelek bû pêk dianîn û evê yekê hişt ku DAIŞê rûbereke berfireh bixe bin destê xwe û livûtevgera wê hêsan bibe. Di nivê sala 2019an de, çekdarên bi navê "Berevanîya Niştîmanî" li çolistanê gelek caran ragihandin ku her hefte zêdetirî 30 leşker hatine kuştin an jî winda bûne, ji ber ku dewrîyeyên wan rastî êrîşa şaneyên DAIŞê yên ku dixwestin kontrola xwe li rojhilatê Humsê xurt bikin dihatin. Heman hêzên li çolistanê gazin dikirin ku fermanدارên wan bê dabînkirin, alav an jî agahdarîyên îstîxbaratê yên têrker mirovan dişandin çolê, û dû re piştî ku DAIŞê êrîşî wan kir, şandina hêzên piştgirîyê yên têrker, topxane an jî piştgirîya hewayî paşguh dikirin.

"احتواء تنظيم الدولة الإسلامية الذي يظهر قدرة على البقاء في شمال شرق سورية" - ص12.

herêmên ku ew kontrol dikin, di serî de Çolistanana sûrî dimeşînin, ji ber ku rejîma Sûrîyayê ji sala 2017an vir ve bi awayekî cidî li dijî rêxistinê şer nekirîye⁹¹."

QSD rasterast rejîma sûrî bi gurkirina rewşê li deverên Dêra Zorê, yên ku di bin kontrola QSD`ê de ne, tawanbar dike⁹² û derxistina nakokîyan⁹³ di navbera pêkhateyên herêmê de, nemaze piştî bûyerên ku li Dêra Zorê di encama êrîş û pevçûnên di navbera QSD û çekdarên ku xwe wekî "hêzên eşîrî" bi nav dikin de qewimîn. QSD`ê destnîşan kir ku "hin alî, bi taybetî hin alîyên ewlehîyê yên girêdayî rejîma Sûrîyê," bûyeran ber bi alîyekî din ve dimeşînin. Wan dest bi tevîkirina hin dilsozên xwe û bi rêya derbasbûna ji qeraxa rojavayê Çemê Firatê û yekbûna bi şaneyên çekdarên girêdayî rejîmê re, di bin navê "Artêşa Eşîran" de, ku "rêxistineke ewlehîyê ya rasterast girêdayî rejîmê ye" kirîye.

Ehmed Fewaz piştrast kir⁹⁴ ku şaneyên veşartî yên DAIŞê bi giranî li ser armancgirtina serokeşîran disekin ji ber ku kesayetên weha nûnertîya beşek fireh a civakê dikin, û kuştina wan dê tirs û xofê bêtir belav bike: "Min tirs di çavên niştecihên herêma ku ez lê dijîyam de dît. Xelk ji tirsê şaneyên veşartî difikirîn koç bikin." Wekî din, "mimkun e ku kaosê bêtir li herêmê belav bikin û wê bê aramî bihêlin." Ehmed destnîşan kir ku kuştina serokeşîran ji hêla serokên şaneyên DAIŞê ve hatîye fermankirin, û ew bi xwe bi pêkanîna çend kuştinên weha hatîye erkdarkirin.

DAIŞ dikarî rewşa ewlehîyê ya jihevketî li Dêra Zorê û gundewarê wê bikar bîne da ku planên xwe bi cih bîne. Wisa dixuye ku kontrola rêxistinê ya berê⁹⁵ li ser hin beşên bajêr rola di hêsankirin û sivikkirina tevgerên wê de li wir lîstîye, nemaze ji ber ku rêxistin di nav deverên eşîrî

⁹¹ Ferhad Şamî, berpîrsê ofîsa ragihandina QSD`ê di hevpeyvîneke li gel amadekarê lîkolînê de, 7`ê Tîrmeha 2024`an

⁹² بیان رسمي لقسد حول "إنهاء عملياتها الأساسية في دير الزور" – الرابط: <https://sdf-press.com/?p=40708>

⁹³ Piştî ku Hêzên Sûrîyaya Demokratîk (QSD) fermanarê Meclisa Leşkerî ya Dêra Zorê, Ehmed el-Xebîl (Ebû Xewla), di 27`ê Tebaxa 2023an de li bajarê Heseke girtin, rewşa ewlehîyê li gundewarê Dêra Zorê bi temamî aloz bû. Piştî ew bi tohmên cûrbecûr ji karê xwe hate bidûrxistin, ev yek bû sedema alozîyan di navbera eşîrên herêmê de, ku paşê veguherî pevçûnên çekdarî û di encamê de zêdetirî 50 sivîl û leşkeran hatin kuştin.

⁹⁴ Hevpeyvînek li gel Ehmed Fewaz El-Rehman, 6`ê hizêrana 2024`an.

⁹⁵ Di sala 2014an de, DAIŞê Dêra Zorê kontrol kir, ku bajarekî girîngîya stratejîk ji ber nêzîkbûna wê bi sînore Iraqê re ye. Di 2`ê Mijdara 2017an de, rejîma Sûrîyê vegerandina bajêr ragihand.

de xwedî hawîrdorek piştgir⁹⁶ e ku li dijî polîtîkayên Rêveberîya Xweser derdikeve. Ev yek şert û mercên guncaw ji bo rêxistinê diafirîne da ku li dijî QSD`ê sor bike û êrîşên dualî li dijî wan pêk bîne (êrîşên çekdarên eşîrî û yên din ji hêla DAIŞê ve). Şer û pevçûnên ku di navbera yên ku jê re "hêzên eşîrî" tê gotin û QSD de derketine bi piranî li gundewarê rojhilatê Dêra Zorê kom bûne, ku asta çalakîya şaneyên DAIŞê bi gelemperî bilind e.

Du: Xebatên dij-terorê ne têrker in

Operasyonên ewlehî⁹⁷ û îstîxbaratî bingeha stratejîya QSD`ê li dijî şaneyên veşartî yên DAIŞê li bakur-rojhilatê Sûrîyayê ne. Ev yek bi êrîşên asmanî yên Hevpeymanîya Navdewletî bi pêşengîya Amerîkayê ve tê temamkirin, ku hêzên ewlehîyê yên navxweyî yên Rêveberîya Xweser, ligel QSD, çekdarên DAIŞê digirin û dişopînin. Ev yek bi taybetî piştî ku DAIŞê stratejîyeke "şerên westandinê" pejirand û bal kişand ser êrîşên lêxistin û revê, ji ber ditirsa ku hêzên wê westin û rasterast werin armancgirtin, lewra ji pevçûnên leşkerî yên rasterast bi dûr diçû.

Di qonaxa berî şerê Baxozê de, di navbera Hevpeymanîya Navdewletî û QSDê de di şerê li dijî DAIŞê de hewldanên zelal û hevkarîya rasterast hebûn. Lêbelê, piştî Baxozê, asta van hewldanan daket asta tenê çalakkirinê⁹⁸, ango di çarçoveya perwerde û parastina hewayî de. Hevrêzîya giştî di navbera QSDê û Hevpeymanîya navdewletî de di asta xwe ya normal de ma û neguherî, ji ber hebûna odeyên operasyonên hevbeş di navbera her du alîyan de. Ji ber vê yekê, kêmbûna asta van hewldanan bû sedema ku QSD bi pevçûnek piralî bi DAIŞê re rû bi rû bimîne. Tevî destkeftiyên berê yên QSDê di şerê li dijî DAIŞê de, ew niha bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû ye ku hewlên wê yên şerê li dijî DAIŞê berûpaş vedigerin û rê li ber şîyana wê ya parastina bi hezaran çekdarên tundrew digirin, ev ji bilî endamên rêxistinê yên jin, ku ew bi zarokên

⁹⁶ Ferhad Şamî, berpîrsê ofîsa ragihandina QSD`ê, ji Navenda Firatê re got: "Gund û dever hene, bi taybetî li Dêra Zorê û Reqayê, ku hîn jî ber bi rêxistinê ve diçin û piştgirîyê didin wê. Em ji ber hasasîyet û xetera wan van deveran wekî 'herêmên sor' bi nav dikin. Hejmareke mezin ji şaneyên veşartî yên rêxistinê li deverên ku berê ji rêxistinê hatine rizgarkirin hene, û mijûlbûna bi wan re dijwar e ji ber ku di nav sîvîlan de xwe vedişêrin, ev ji bilî hevkarîya hin sîvîlan bi van şaneyan re li hember pereyan."

⁹⁷ Hêzên Taybet ên Ewlehîyê yên QSDê û Yekîneyên Dijî Terorê di pêşengîya hewldanên şerê li dijî DAIŞê de ne.

⁹⁸ Hevpeyvîneke ⁹⁸ Navenda Firatê bi Ferhad Şamî, berpîrsê ofîsa ragihandina QSD`ê re.

xwe re di kampan de ne. Şaneyên DAIŞê fermanên QSDê û serokêşîran armanc digirn û bi rêya tirsê bandora xwe li ser mirovên ku li deverên berê⁹⁹ ji hêla DAIŞê ve dihatin kontrolkirin dijîn zêde bikin. Bi taybetî, bandora berfireh a şaneyên DAIŞê li Dêra Zorê tirsek di nava niştecihan de bi xwe re anîye û hewldanên berhevkirina îstîxbaratê yên QSDê û hevpeymanîya navneteweyî têk birîye. Ji ber vê yekê, di vê qonaxê de pêwîstîyek mezintir bi piştgirîkirina QSD`ê heye, ji ber ku şerê li dijî van şaneyan taktîk û rêbazên pêşketî û modern hewce dike ku li ba QSD`ê peyda nabin¹⁰⁰.

Li alîyêkî din, derengmayîna darizandina çekdarên DAIŞ`ê yên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê girtî ne jî ji bo xebat û operasyonên QSD û Hevpeymanîya Navdewetî li dijî Şaneyên veşartî dibe astengî, û ne dûr e ku DAIŞ bixwe vê derengmayîna han bi kar bîne û di alîyê propeyandaya xurtkirina navûdengîya rêxistinê di nava alîgirên wê de li herêmê û tevaya cîhanê bi kar bîne û bêje Dewleta Îslamî li Îraq û Şamê hîna heye û roj bi roj berfirehtir dibe, bêyî ku ti cezayekî qanûnî yan astengîyeke din li pêşîya wê hebe. Ji wê zêdetir, ev derengmayîna han dibe barekî hiqûqî û qanûnî li ser milê Rêveberîya Xweser di wextekî de ku ti piştgirîyeke sîyasî yan aborî bo wê nayê pêşkêşkirin¹⁰¹.

Pêngav û operasyon

Hêzên Sûrîyaya Demokratîk (QSD) û Hêzên Ewlekarîya Hundirîn ên Rêveberîya Xweser, bi hevkarîya Hevpeymanîya Navdewletî, ji dema têkçûna rêxistinê li Baxozê sala 2019an, bi taybetî li deverên ku berê ji rêxistinê hatibûn rizgarkirin, wek Reqa, Dêra Zor û gundewarê Heseke, li seranserê bakur û rojhilatê Sûrîyayê (herêmên Rêveberîya Xweser) gelek operasyon û pêngavên ewlehîyê li dijî şaneyên veşartî yên DAIŞê pêk anîne, li gel pêngav û operasyonên li kampa Holê jî hatin encamdan.

⁹⁹ DAIŞ`ê ji nivê sala 2022`an û vir de êrîşên xwe yên li dijî bendên kontrolê li gundewaran zêde kir, û pê re teqemenîyên bideştçêkirî yên wesayîtên şervanên QSD`ê dikin armanc bi kar anîn, weke ku hewl bidin rê li ber hevkarîya çî kesî bi hêzên ewlekarîyê re bigirin. Di van êrîşan de şaneyên ku ji 5-6 êrîşkaran pêk dihat dihatin bikaranîn, û bi wan re hejmarek çekdar alîkarîya wan dikirin û ji dûr ve çavdêrî dikirin. Jêder:

. "احتواء تنظيم الدولة الإسلامية الذي يظهر قدرة على البقاء في شمال شرق سورية" - ص 24.

¹⁰⁰ Jêdera navborî, R5

¹⁰¹ Hevpeyvînek bi Xalid Îbrahîm, endamê desteya Rêveber a Têkilîyên Derve ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re, 21ê Tebaxa 2024an de hatiye kirin.

Bi van pêngav û operasyonan bi sedan endamên şaneyên veşartî yê rêxistinê hatin girtin û gelek çek û cebilxane hatin desteserkirin. Lê belê, tevî vê yekê, rewşa li bakur-rojhilatê Sûrîyayê ji ber çend sedeman nêrîm dimîne, ya herî girîng jî çalakîya berdewam a şaneyên DAIŞê û operasyonên wan ên bi armanca têkbirina ewlehî û aramîyê. Ji ber vê yekê, ev operasyon û pêngav bê encam dimînin û tenê armanc dikin ku serkeftina leşkerî bi dest bixin, bêyî ku rêxistin û îdeolojîya wê ji kokên wê were rakirin. Hewldanên nerm¹⁰² ên Rêveberîya Xweser û civaka navneteweyî, nemaze li deverên ku ji rêxistinê hatine rizgarkirin, li gorî hewcedarîyên heyî ne li gorî asta pêwîst û gunçaw in. Ji ber vê yekê, tevî destkeftiyên girîng ên li dijî rêxistinê hatine bidestxistin jî, lê dîsan jî ew destkeftî bi parastina aramîya ewlehîyê ya jiberhevçûyî ve girêdayî ye.



Ji bo naskirin û çîrovekirina bêaramîya ewlehîyê ya berdewam li herêmên Rêveberîya Xweser, rewşa li kampa Holê, ku gelek pêngavên ewlehîyê ji hêla QSD û Hêzên Ewlekarîya Navxweyî ve li dijî şaneyên veşartî yê DAIŞê hatine lidarxistin, wekî mînakek ji rewşa ewlehîyê ya tevlihev a ku rêveberîya xweser piştî jiholêrakirina "xîlafeta" DAIŞê li bakur-rojhilatê Sûrîyayê pê re rû bi rû maye.

¹⁰² Hîn jî li bakur û rojhilatê Sûrîyayê dever hene ku ji bo vegera DAIŞê wekî zemînek şîn tene hesabandin. Hewldanên ne-leşkerî li van deveran bi leza pir hêdî û qels pêşve diçin, nemaze di biwarê jiholêrakirina îdeolojîya tundrew a rêxistinê û xebata ji bo entegrekirina komên civakî yê alîgirê DAIŞê di nav civakên wan ên berê de (berî ku DAIŞ bigire dest) û guhertina raman û baweriyên wan. Di encamê de, paşguhkirina hewldanên nerm dê bibe sedema zemînek ji bo tevlikerîna endaman û avakirina bingehek gelêrî ya bi DAIŞê re dilsoz.

Kampa Holê yek ji pirsgirêkên herî girîng e ku fikar û tirsê çêdike¹⁰³, ew jî ji ber bandora zêde ya DAIŞê li kampê û belavbûna îdeolojîya wê. Ew her wiha ji ber girîngîya xwe ji bo rêxistinê bûye mîna "dewleteke DAIŞê". DAIŞ hewl dide ku bi rêya şaneyên xwe yê veşartî yê li nav kampê, wê deverê kontrol bike, ev jî bilî perwerdekirina zarokan û amadekirina artêşeke bi navê "Aşbal El-Xîlafa", li alîyekî din, jinên DAIŞê jê hîna li nav kampê zarokan tînin û wan li ser fikirê DAIŞê mezin dikin, ev hemû jî ji bo jinûvejandina DAIŞê û amadekirina nîşekî nû ji artêşa "DAIŞ a pêşerojê"¹⁰⁴.

Li kampê gelek caran sûcên kuştin û tundûtûjîyê li ser destê şaneyan encam didin, û di 4 salan de bêhtirî 150 sûcî çêbûne, û tenê sala 2023`an 36 sûcên kuştinê hatine tomakirin¹⁰⁵. Cîhan Henan, birêvebera Kampa Holê dibêje: "Rola hêzên ewlekarîyê tenê parastin û çavdêrîkirina dergehên sereke yê kampê ye, her wiha dewrîyeyan jî li nav kampê digerin bîyê ku baregeh an navendên wan yê sabit li nav kampê", her wiha "bi derfetên biçûk û karînen hêsan niştecihên kampê diparêzin, û tevî ku pêngavên ewlekarîyê her I kampê tînin encamdan, lê dîsan jî bûyerên ewlehîyê çêdibin"¹⁰⁶.

Dumahî

Tevî têkbirina "xîlafet"a wê, hîna jî çalakîyên DAIŞê yê çekdarî li Sûrîyayê bi dawî nebûne, û sal bi sal êrîşên şaneyên wê yê veşartî zêdetir dibin, ev yek bixwe ji me re nîşan dide ku DAIŞ wek rêxistin bi dawî nebûye, nemaze ku faktorên dihêlin rêxistin berûpêş biçê hîna hene, eger li ser asta xwecihî be yan jî herêmî û navdewletî, ev li gel ku ti destpêşxerî û gavên navdewletî yê cîdî tune ne ku rêxistinê ji kok ve tîk

¹⁰³ Neteweyên Yekbûyî bi berdewamî hişyarî daye li ser xirabûna rewşa ewlehîyê ya li kampê. Di raporeke Sibata 2022an de, Koma Xebatê ya Konseya Ewlehîyê ya NY ya li ser DAIŞ û Grûpên Din ên Cîhadî "mînakeyên radîkalîzm, perwerde, berhevkirina pereyan û handana ji bo pêkanîna operasyonên derveyî" li kampê ragihand.

¹⁰⁴ Vegere: Zarokên DAIŞê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê.. (Metirsî, kêşe, û rêyên çareserîyê) – Navenda Firatê ya lêkolînan: <https://firatn.com/kur/?p=2461>

¹⁰⁵ Rojnameya Brîtanî The Independent, di nixandina xwe de got ku kampa Holê li bakur-rojhilatê Sûrîyayê, ji ber zêdebûna hejmara kuştinan li wir, bûye yek ji "cîhên herî xeternak û xwîn yê li ser rûyê erdê". (Inside the 'deadliest place on earth': Murders surge in Syrian refugee camp stalked by Isis) - <https://2u.pw/8nYEBegR>

¹⁰⁶ كمال شيخو - "«قسد» تعرض حصيلة عملياتها ضد «داعش» خلال 2023 - صحيفة الشرق الأوسط - الرابط: <https://2u.pw/dq8Hxdr>

bibe, yan jî hindekî bare QSD û Rêveberîya Xweser sivik bikin, nemaze meseleya qonaxa piştî têkbirina "xîlafetê" ku paşmahîyên mirovî û îdolojîk ên xeternak bê çareserî hatin hiştin, di serî de jî şerê şaneyên veşartî yên ku hejmara wan bi hezaran tê texmînkirin. Li ser vî esasî em gihîştin hin encam û qewêtîyan.

Encam:

1- Stratejîya ku rêxistina DAIŞ`ê piştî bidawîbûna xîlafeta wê pejirandibû, ku xwe dispêre şaneyên xwe yên veşartî, li gorî şert û mercên heyî bû. Ji ber vê yekê, ragihandina têkçûna wê tenê destpêka qonaxek nû ya veguhêz di şerê li dijî rêxistinê de li Sûrîyayê bû.

2- Di wextekî de ku faktorên bi çalakîya DAIŞ`ê re dibin alîkar hîna hene û liberçav in, xetera vegera rêxistinê bi awayekî xurttir û rêxistinkirî hîn jî heye, û ne dûr e ew di dem û cihê guncaw de "xîlafetek" nû careke din ragihîne.

3- Hewldanên herêmî û navdewletî ji bo jîholêrakirina rêxistinê ne têrker û ne jî biryardar in. Ew di çarçoveya kontrolkirina rêxistinê û sînordarkirina demkî ya çalakîya wê de dimînin, nemaze di derbarê "hewldanên nerm" de li deverên ku ji rêxistinê hatine rizgarkirin.

4- Girtîgeh û kampên malbatên DAIŞê hedefa sereke ya planên DAIŞ`ê ne. Êrîşa li ser girtîgeha Xiwêranê sala 2022an mînakek ji berfirehîya planên xeternak ên komê bû, nemaze ji ber valahîyên ewlehîyê yên girîng ên ku hîn jî di van navend û kampan de hene. Kampa Hol li bakur-rojhilatê Sûrîyayê bûye çavkanîyeke navendî ji bo hêmanên DAIŞê, ku wekî "dewletek" û cihê ewle ji bo avakirina artêşeke nû ya çekdarên DAIŞê kar dike.

5- Nakokî û alozîyên berdewam di navbera endamên Hevpeymanîya Navdewletî ya ku li dijî rêxistinê şer dike de faktoreke girîng e ku beşdarî hêsankirina tevgera şaneyên veşartî yên DAIŞê û zêdekirina çalakîyên wan li Sûrîyayê dibe. Di wextekî de ku Sûrîyayê dabeşî gelek herêmên hegemon bûye û her wiha nakokîyên herêmî û navdewletî yên ku bandorê li şerê li dijî terorîzmê li Sûrîyayê dikin hîna hene.

6- Nebûna cidîtîyê ji alîyê hikûmeta Şamê û Rûsyayê ve di şerê li dijî rêxistinê de bûye sedema ku çekdarên rêxistinê li Çolistanê Sûrîyayê xwe komîserhev bikin, û bûye xaleke destpêkirina êrîşan li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.

7. Herêmên ku ji hêla Tirkîyeyê ve li bakurê Sûrîyayê hatine dagirkirin ji bo serkirdeyên asta jorîn ên DAIŞê bûne deverên ewle. Ji ber vê yekê, fermanên ku şaneyên DAIŞê distînin ji herêmên ku ji hêla muxalefeta Sûrîyayê ya ku ji hêla Tirkîyeyê ve tê piştgirî kirin ve têne, ji ber ku endam û serkirdeyên DAIŞê dikarin bi hêsanî li van herêman bigerin.

8. Derengketina çareserkirina aloziya Sûrîyayê dikeve ber berjewendiyên rêxistinên terorîst de, bi taybetî jî DAIŞ.

9. Nebûna naskirineke siyasî bi Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê astengîyekê li pêşîya hewldanên dijî-terorê li herêmê nîşan dide, nemaze ji ber ku hin pirsgerêk hene di çarçoveya qanûnên civaka mirovî ya navneteweyî de, hewldanên navneteweyî û têkilîya fermî bi Rêveberîya Xweser re hewce dikin, wekî mijara kampên malbatên DAIŞê, girtîgehên çekdarên DAIŞê û navendên rehabilitasyonê yên zarokên wê.

Qewetî:

- Çareserkirina pirsgerêka şaneyên veşartî yên DAIŞê di çarçoveya qonaxêke nû û aloztir a şerê li dijî DAIŞê de, û aktîvkirina rola hevpeymanîya navdewletî da ku ji berî 2019`an bibandortir be. Divê ev rol ji hêzê wêdetir were bipêşxistin da ku beşdarîya rasterast ligel hewldanên hêzên herêmî yên çalak li ser erdê jî di nav xwe de bigire.

- Xebat ji bo jîholêrakirina faktorên ku bûne sedema derketina DAIŞê û zêdebûna çalakîya şaneyên veşartî yên wê, bi taybetî êrîş û gefên dewleta Tirkîyê li dijî herêmên Rêveberîya Xweser, û alozî û pevçûnên herêmî yên ku xizmeta berjewendiyên rêxistinên terorîst dikin, nemaze yên ku di navbera dewletên endamên Hevpeymanîya Navdewletî ya li dijî DAIŞê de çêdibin.

- Zêdekirina piştgirîya leşkerî û lojîstîkî ji bo QSDê, ji ber ku rasterast li dijî şaneyên veşartî şer dike, bi taybetî di derbarê taktîk û rêbazên pêşketî û nûjen ên rûbirûbûnê de ku li ba QSD tune ye.
- Bi ewlekirina girtîgeh û kampên malbatên DAIŞê û rêgirtina li ber valahîya ewlehîyê ya ku ji hêla şaneyên DAIŞê ve tê bikar anîn. Wekî din, ewlekirina rêyên bazirganîyê li hemî deverên Sûrîyayê, ku wekî çavkanîyek girîng a piştgirîya darayî ji bo rêxistinê têne hesibandin.
- Piştgirî û zêdekirina hewldanên hêza nerm li deverên ji destê DAIŞê hatine rizgarkirin, wek Reqa, Dêra Zorê û gundewarê Heseke, û xebat ji bo zuhakirina çavkanîyên îdeolojîya DAIŞê.
- Naskirina sîyasî ya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê dê hewldanên dijî-terorê li herêmê xurt bike û pirsgerêkên mayî yên ku ji hêla şaneyên veşartî yên DAIŞê ve têne bikaranîn da ku çalakî û operasyonên xwe zêde bikin çareser bike. Ev pirsgerêk pirsgerêka malbatên DAIŞê yên li kampan, zarokên DAIŞê yên li navendên rehabilitasyonê, û darizandina endamên DAIŞê yên li girtîgehan in.
- Pêşxistina reformên sîyasî li herêmê, jiholêrakirina gendelîyê, û balkişandina ser baştirkirina şert û mercên jîyan û aborî û têkoşîna li dijî îdeolojîyên tundrew ên ku dibin sedema gurkirina nakokîyên mezhebî û dabeşbûna civakî.

Jêder û çavkanî

Pirtûk:

- محمد نعمة السماوي، "الخلايا النائمة والتقنيات المتطورة لصناعة الإرهاب"، دار الكتب التاريخية ناشرون، الطبعة الأولى، 2015.

Lêkolîn:

- د. محمد أبو رمان، "مستقبل داعش: عوامل القوة والضعف (ديناميكيات «الخلافة الافتراضية» وفجوة استراتيجيات مكافحة الإرهاب)"، دراسة تحليلية، تشرين الثاني 2020.

- Zarokên DAIŞ`ê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê.. (Metirsî, kêşe, û rêyên çareserîyê) – Navenda Firatê ya lêkolînan: <https://firatn.com/kur/?p=2461>

Raporên hiqûqî û rojnamevanî:

- "احتواء تنظيم الدولة الإسلامية الذي يظهر قدرة على البقاء في شمال شرق سورية"، مجموعة الأزمات حول الشرق الأوسط، تموز 2022 | تقرير الشرق الأوسط، رقم 236.
- "ملف خاص: معلومات وأسماء قيادات ومقاتلي داعش الذين يقاتلون الآن ضمن صفوف الفصائل التابعة لتركيا في شمال سوريا"، الرابط: <https://vdc-nsy.com/archives/27336>
- جوان سوز، "تهديد أمني تثيره جهاديات مخيم الهول السوري"، موقع صدى، رابط: <https://n9.cl/b8zqjv> المادة:
- صحيفة الشرق الأوسط:
- استكمال البحث عن سجناء «داعش» في الرقة بمساعدة استخبارات «التحالف»، الرابط: <https://2u.pw/rGrvxFOY>
- "نساء «الخلافة» في «الهول» و«روج»... مصائر مجهولة على مد البصر"، الرابط: <https://2u.pw/Uf0YVC7w>
<https://2u.pw/gcz8Zbjv> - 89 قتيلًا في «تمرد داعش» بالحسكة، الرابط:
- صحيفة العرب، "تقوية تركية في التعامل مع داعش: حليفة له وشريكة في التحالف ضدّه"، الرابط: <https://2u.pw/PwcnGSSA>
- مركز توثيق الانتهاكات، "اعترافات: خلية مولتها تركيا قامت بتنفيذ 20 عملية وتسببت بمقتل 200 شخص"، الرابط: <https://vdc-nsy.com/archives/26250>
- مركز معلومات شمال وشرق سوريا، "تقرير الخلايا النائمة لشهر ديسمبر، داعش يغتال مدنيين مرتبطين بـ الإدارة الذاتية لشمال وشرق سوريا"، الرابط: <https://2u.pw/snlonkiW>
- وكالة نورث برس، "زكاة بالإكراه.. داعش يفرض الإتاوات على ميسوري الحال في دير الزور"، الرابط: <https://2u.pw/tuddltbp>

Gotar:

- بهاد الدين عياد، "كيف يستثمر "داعش" الحرب الروسية - الأوكرانية؟"، اندبندنت: <https://2u.pw/mdTcFa>، الرابط:
- حسين أبو هنية، "تنظيم الدولة" وهدية جائحة "كورونا"، موقع عربي 21، الرابط: <https://2u.pw/rmkZLrxT>

- (الجهادية العالمية تنتعش بفضل جائحة "كورونا")، معهد السياسة والمجتمع، الرابط: <https://2u.pw/3sRBSc0I>
- ديفورا مارغولين وكميل جابلونسكي، "بعد خمس سنوات على سقوط الخلافة، لا يزال الكثير كما هو في شمال شرق سوريا"، معهد واشنطن لسياسات الشرق الأدنى، الرابط: <https://2u.pw/0jnwVYW1>
- لزيكين إبراهيم، "داعش" يعيد إحياء نفسه... الاستراتيجية والهيكلية التي يتبعها والعوامل المساعدة، مركز الفرات للدراسات، الرابط: <https://firatn.com/?p=4200>
- مظلوم عبدي، "حرب المسيرات التركية تدمر البنية التحتية لـ"قسد" في شمال شرق سوريا وتحشد من جهود مكافحة الإرهاب"، مندى فكرة (وهي مبادرة لمعهد واشنطن ميرفت عوف، "عودة تنظيم الدولة.. ماذا وراء أحداث سجن الحسكة السوري؟"، <https://2u.pw/J3Emkk41> شبكة الجزيرة، الرابط: <https://2u.pw/J3Emkk41>
- هارون ي. زيلين وإيلانا وينتر، "عام واحد على خريطة أنشطة تنظيم الدولة الإسلامية على الصعيد العالمي"، معهد واشنطن لسياسات الشرق الأدنى، الرابط: <https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/am-wahd-ly-khrytt-anshtt-tzym-aldwlt-alaslamyt-ly-alsyd-alalmy>

Gotarên bi zimanê bîyanî:

- Aaron Stein, "Islamic State networks in Turkey", Atlantic Council: <https://www.atlanticcouncil.org/in-depth-research-reports/issue-brief/islamic-state-networks-in-turkey/>
- Aaron Y. Zelin, Devorah Margolin, "The Islamic State's Shadow Governance in Eastern Syria Since the Fall of Baghuz", Washington Institute: <https://2u.pw/XtGQDYKg>
- Charles Lister, "CENTCOM says ISIS is reconstituting in Syria and Iraq, but the reality is even worse": <https://2u.pw/hR0uj0p8>
- Jason Burke- "Gaza conflict could fuel IS and al-Qaida revival, security experts warn"- The Guardian- Link: <https://2u.pw/E2zMK2Cb>
- RIC - The Battle of Heseke 2022: Timeline and Analysis: <https://2u.pw/bHps71mR>

Malper:

- <https://etidal.org/reports/cells/> موقع اعتدال، تفكيك الخلايا، الرابط:
- موقع العين الإخبارية، "استراتيجيات داعش بعد انهيار جغرافية التنظيم"، الرابط: <https://al-ain.com/article/terrorism-geographically>
- موقع عربي 21، "تنظيم الدولة يعود لشن هجمات بسوريا تستهدف حقول النفط"، الرابط: <https://2u.pw/CD3eeR4h>
- موقع دار الإفتاء المصرية، "مرصد الإفتاء: غزوات الاستنزاف" استراتيجية الدواعش: <https://cuts.top/HDHZ> للعودة إلى الخلافة المزعومة"، الرابط:
- موقع فكرة، "بقاء عناصر داعش" الفارين من سجن الصناعة، يقلق سكان الحسكة"، الرابط: <https://2u.pw/llMwplgR>
- موقع قناة العربية، "أجرت موفدة قناة العربية مقابلة خاصة مع أحد عناصر داعش الموقوفين، تحدث فيها عن خلايا التنظيم النائمة في المنطقة"، الرابط: <https://www.youtube.com/watch?v=eoJsCv81S2A>
- داعش كسر الأقفال.. دواعش يفجرون مفاجآت عن المصالح المشتركة بين التنظيم وتركيا"، الرابط:

<https://www.youtube.com/watch?app=desktop&v=VW1EIS2X6AI>

- "قيادي بداعش يكشف للعربية تفاصيل الهجوم على سجن غويران في سوريا"، <https://www.youtube.com/watch?app=desktop&v=-qJRi3cSlxw> الرابط:
- موقع قوات سوريا الديمقراطية، "بيان القيادة العامة لقوات سوريا الديمقراطية بخصوص الهجوم الأخير لإرهابيي داعش على سجن الصناعة"، الرابط: <https://sdf-press.com/?p=36152>
- موقع المرصد السوري لحقوق الإنسان:
 - "قوى الأمن الداخلي" أسايش " تحبط محاولة تهريب نساء من الجنسية العراقية من <https://n9.cl/9unck> مخيم "الهول" جنوب شرق الحسكة"، الرابط:
 - "قوات سوريا الديمقراطية تلاحق فلول داعش في "الهول""، الرابط: <https://n9.cl/b2u82>
 - "بمعدل نحو استهداف كل يوم.. المجموعات التابعة لإيران تستهدف القواعد الأميركية في سورية 54 مرة منذ مطلع العام الجديد نحو 40 منها على حقل العمر <https://2u.pw/YPH1Hd2L> وكونيكو"، الرابط:
 - خلايا "التنظيم" تهاجم حاجزاً لقوى الأمن الداخلي "الأسايش" في ريف دير الزور <https://2u.pw/INaxRgE3> الشرقي - الرابط:

- "تنظيم الدولة الإسلامية يعلن عن إطلاق حملة "نار" لزعيمة EuroNews موقع ،
الرابط: <https://2u.pw/BYHjXXT3> السابق"،
- موقع وكالة الفرات، "المخابرات السورية تقف خلف اغتيال وجهاء العشائر العربية"،
الرابط: <https://n9.cl/tm4d5>
- تجري لقاءً مع العقل المدبر لتفجير نوروز الحسكة ANHA موقع وكالة هاوار،
الرابط: <https://2u.pw/ArG3XL42> وعشرات الهجمات في الجزيرة"،